Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1341 11-Çile-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Berxwedêrên Bendava Tişrînê: Vîna azad ji hemû çekan bihêztir e’

Hêvî Keleş/ Qamişlo

**Dayikên berxwedêr ku bûn şahidê berxwedana Bendava Tişrînê û cihê xwe di nav de girtin diyar kirin ku berxwedana li bendavê hat meşandin ne ji rêzê bû, ew berxwedan di rûpelên dîroka Şoreşa Rojava de hat neqişandin û serkeftin misoger kir.**

Salek di ser berxwedana Bendava Tişrînê re derbas dibe, ew berxwedanî yek ji qonaxên dîrokî li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye. Bi wê berxwedanê hat tekezkirin ku herdem îradeya gelan bi ser dikeve.

**Berxwedana gel... biryara gel bû**

Berxwedan tenê bi komekê ve sînordar nebû, têde jin, ciwan, kal û pîran cihê xwe girtin, di heman demê de ji tevahî pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevlî berxwedanê bûn. Herwiha li Bendava Tişrînê yekîtiyan gelan a li dijî dagirkeriyê derket pêş. Di berxwedana Bendava Tişrînê de, di encama topbarana dewleta Tirk û çeteyên wê de gelek sivîl şehîd bûn, rojamevanên ku


Şeha Hesarî

bi kamîreyên xwe berxwedana bendavê ji cîhanê radigihandin jî bûn armanca êrişên dagirkeriyê. Her ku êrîşên li ser derdora Bendava Tişrînê berdewam dikirin, berxwedan ne tenê bi şervanên hêzên leşkerî ve sînordar bû, gel jî û bi taybet jinên berxwedêr jî li kêleka şervanan cihê xwe di berxwedanê de digirtin.
Derbarê berxwedana Bendava Tişrînê de, dayikên bi navê Emîra Hiso û Şeha Hesarî ku cihê xwe di nava berxwedaniya bendavê de girtin û bûn şahidên berxwedana dîrokî, ji rojnameya me re axivîn û beha berxwedanê kirin.

**‘Em ê bendava xwe ji dagirkeriyê biparêzin’**

Dayika bi navê Şeha Hesarî li ser tevlîbûna xwe li bendava berxwedanê wiha got: “Çûna me ji bo wir pir girîng bû, ji ber ku


Emîra Hiso

dagirkeriyê û çeteyan hewl didan ku bendavê dagir bikin. Wêraniya ku ji ber şerê li herêmê çêbû pir eşkere bû, lê me berxwedana xwe berneda. Hilweşîna bendavê dê ji bo tevahiya gelan karesatek mezin ba. Balafirên şer rasterast em hedef girtin, berxwedana dayikan bersiva van êrîşan bû, herwiha moralê me ji êrîşên wan mezintir bû. Em gelekî banga aştiyê dikin, lê dijmin êrîşên dagirkeriyê yên hovane li dijî me dike. Ji ber vê yekê, hilweşandina Bendava Tişrînê dê ji bo mirovahiyê felaketek mezin be û ji ber vê sedemê, em ê heta dawiyê berxwedana xwe bidomînin û em ê bendava xwe ji hilweşînê biparêzin. Min rû dîtin ku tevî êrîşan pêşve neçûn, tevî serma, westandin û xetereyê jî berxwedanî dikirin, hemû bi yek dengî digotin ku ev erd ne tenê cihek e, lê belê rûmet, dîrok, bîr û nasname ye.”



**‘Ew ne bûyerek demkî ye’**

Dyika bi navê Emîra Hiso jî derbarê tevlîbûna berxwedana Bendava Tişrînê de wiha got: “Em ne aliyekî şer in, em xwediyên erd û avê ne, em li wir bûn da ku mafê xwe yê jiyanê biparêzin. Dema ku av û elektrîk di bin gefê de bin, ti ferq di navbera kesî de tune, her kes berpirsiyarê parastina wan e. Em ne ji bo şerkirinê, lê ji bo parastina jiyana xwe li wir bûn, ji ber ku bendav tê wateya mayîndebûne me. Bendava Tişrînê ne tenê xeteke parastinê ye, lê cihekî efsanewî yê azadiyê ye ku bi berxwedana hevbeş a gel hatiye avakirin. Ew kêliyek bû ku ne tenê pevçûnek leşkerî bû, lê îradeya rastîn a tevahiya gelan bû ku li hemberî tofanê raweste, her çend xetera wê dijwar be jî. Di wan rojan de, karker, cotkar, jin, zarok û kal û pîr bi hev re rawestiyan da ku ragihînin azadî ne tenê dirûşme ye, lê kiryarek rojane ye ku di axê de, di bîranîn û rûmetê de lêdide. Di salvegera yekem a berxwedana Bendava Tişrînê de, em li ber yek ji kêliyên herî girîng ên dîroka herêma xwe ne, vê kêliyê nîşan da ku gel, bi hemû cihêrengiya xwe, îspat kir ku îradeya azad ji çekan bihêztir e û hişmendiyeke gelêrî ya hevgirtî ji hemû şêweyên şerê hovane ku dagirkeriya Tirk hewl da li ser civakê di

Sudoku:Pirs 72

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | 4 | 6 | | |
| 8 | 6 | | 5 | | 3 | | | |
| | 2 | 5 | | | 9 | | 3 | |
| 4 | | | 3 | | | | | 2 |
| 3 | | | 2 | 8 | 6 | | | 9 |
| 2 | | | | | 5 | | | 6 |
| | 3 | | 9 | | | 2 | 5 | |
| | | | 6 | | 7 | | 1 | 3 |
| | | 8 | 1 | | | | | |

Sudoku: Bersiv 71

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 5 | 7 | 3 | 8 | 1 | 2 | 4 | 9 |
| 4 | 1 | 3 | 9 | 2 | 6 | 5 | 7 | 8 |
| 2 | 9 | 8 | 7 | 5 | 4 | 6 | 1 | 3 |
| 1 | 8 | 6 | 2 | 3 | 9 | 4 | 5 | 7 |
| 5 | 3 | 4 | 6 | 7 | 8 | 1 | 9 | 2 |
| 7 | 2 | 9 | 1 | 4 | 5 | 3 | 8 | 6 |
| 8 | 7 | 1 | 4 | 6 | 3 | 9 | 2 | 5 |
| 3 | 4 | 5 | 8 | 9 | 2 | 7 | 6 | 1 |
| 9 | 6 | 2 | 5 | 1 | 7 | 8 | 3 | 4 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER PÊDIVIYÊ**

**Çavê me li ber destê we ye:**
- Pêwîstiya me bi we heye.
**Çavê we li ser me be:**
- Bi heman wateyê.
**Dawet bê berbûk nabe:**
- Ew kar bê filan tiştî nabe.
**Ji ta heta derziyê:**
- Her tişt; tişta ku pêwîst.
**Kesê bikeve govendê wê xwe bihejîne:**
- Dema mirov dest biavêje tiştekî divê mirov baş bike, tişta pêwîst divê mirov bike.
**Kesê here dawetê divê xwe bihejîne:**
- Bi heman wateyê.
**Kûçikê têr êrîşî guran nake:**
- Kesê pêwîstiya wî tinebe xwe naêşîne.
**Riya pînedûz li ber derê solker dikeve:**
- Kesê muhtacê tiştekî be di dawiyê de wê biçe cihê ku pêwîstiya xwe lê pêk bîne. (Pînedûz: Kesê dixwaze sola xwe pîne bike)

**LI SER HÊVÎ Û BENDEWARIYÊ**

**Bila çêleka mirov avis be kengê za**
- Ku daxwaziya mirov pêk were dereng jî pêk were xem nake.
**Biviran dar birî, yê li ser darê hêvî ji Xwedê nebirî:**
- Çiqas mirov bikeve tengiyê jî divê mirov hêviya xwe nebire.
**Çavê min dikutkute:**
- Diyar e ku wê mizgîniyeke xweş ji min re were.
**Çavê min li riya wî ye:**
- Ez li benda wî me; ez li hêviyê me.
**Çavên min li riya wî qerimîn:**
- Ez pir li benda wî mam; pir ma dereng.
**Çêleka mirov avis be kengê za:**
- Ku daxwaziya mirov pêk were dereng jî pêk were xem nake.
**Çêlek avis e şîr qismet e:**
- Bi heman wateyê.
**Guhê wî hê li ser çingîniya şûjinê ye:**
- Hê li benda tişta borî ye; ji destê wî derketiye hê li bendê ye.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Careke din dengê jinan li meydanan vejîn dibe’



Li dijî zihniyeta melayî û rewşa aborî ya zehmet li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê xwepêşandanên gel ji 15 rojan ve hatine destpêkirin. Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tekez kirin ku careke din dengê jinan li meydanan vejîn dibe, herwiha yekbûn û piştgiriya xwe ji jinên Kurd û yên azadîxwez re raber kirin.**R-2**

## Rêber Apo sazûmankarê azadî û aştiyê ye

Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê li bajarê Dêrikê Ciwan Hesen diyar kir ku Rêber Apo ji bo gelê Kurd û tevahî gelên azadîxwaz sazûmankarê azadî û aştiyê ye, azadiya civakî bi azadiya Rêber Apo pêkan e.**R-3**




Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1341 11-Çile-2026 www.ronahi.net/ku/
Nirx: 500 L.S



## Aboriya Komînal

Aboriya komînal modeleke rêxistina aborî ye ku li ser bingeha hevgirtin û edaleta civakî ku bi beşdariya civakê hatiye şekilgirtin. Di vê modelê de, armanc ne qezenca takekesî ye, lê belê bicihanîna pêdiviyên civakê û parastina çavkaniyan e.**R-8**



## Gelo wijdanê wan li ku derê ye?


Goristanên şehîdan, mezargeh, mizgeft û dêrên îbadetê di nava civakan de cihên pîroz in ku pêwîst e hurmet ji wan re bê girtin. Lê dewleta Tirk û çeteyên wê hemû pîvanên mirovahiyê bin pê dikin û cihên pîroz jî wêran û talan dikin.**R-7**

## Ji çiraxên wêjeya Kurdî

Hunermenda Kurd Hêvîn Efrîn hunera xwe dike bin xizmeta welatê xwe de û dengê zeytûnê û sirûda Çiyayê Kurmênc...**R-9**

# HIKUMETA DEMKÎ YA SÛRIYÊ KOLEYA DERVE Û ÇAVSORÊ HUNDIR E

Hikumeta demkî ya Sûriyê ji destpêka hatina li ser desthilatdariyê û heta niha li dijî gelên Sûriyê qirkirinê dide meşandin, ji beravên Sûriyê bigere heta Siwêdayê û herî dawî li Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê li dijî gel komkujiyan pêktîne. Ev hikumeta ku qaşo bi navê parastina gel û serweriya xaka Sûriyê bang dike, li aliyekî gel qir dike û li aliyên din jî xaka Sûriyê di bazaran de difroşe hêzên derve, tenê armanca wê jî mayîna li ser desthilatdariyê ye.**R-5**







## ‘Heta destê Tirkiyê di Sûriyê de hebe çareserî zehmet e’

Endamê Desteya Rêveber a Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk Kurdiyar Direî diyar kir ku Tirkiyê siyaseteke pir xerab di hundirê Sûriyê de da meşandin û hîna jî ev siyaset berdewam e, lewra heta destê Tirkiyê di Sûriyê de hebe, çareseriya Sûriyê zehmet e.**R-4**

## ‘Civatên ji bo kîndarî û şerê mezhebî nayên qebûlkirin’

Rûspiyên Êla Sada û Eşîreya Elbûşêx diyar kirin ku civatên ji bo kîndarî û şerê mezhebî nayên qebûlkirin, kesên van civînan li dar dixin nûnertiya xwe tenê dikin û gotin, “Hikumeta demkî ji bo lawaziya xwe ya siyasî û aborî veşêre, gavan ji bo bidawîkirina tevlîheviyan naavêje."**R-6**




**Du taxên ku bi du welatan e**
Bêrîtan Xalid R-2


**Çima Berxwedana Şêxmeqsûd û Eşrefiyê?**
Idrîs Henan R-4


**Vê zihniyeta Kurdkujiyê, wê serê wan bixwe**
Ahmet Aktaş R-6

# ‘Careke din dengê jinan li meydanan vejîn dibe’

Li dijî zihniyeta melayî û rewşa aborî ya zehmet li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê xwepêşandanên gel ji 15 rojan ve hatine destpêkirin. Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tekez kirin ku careke din dengê jinan li meydanan vejîn dibe, herwiha yekbûn û piştgiriya xwe ji jinên Kurd û yên azadîxwez re raber kirin.

**Esma Miştefa/Qamişlo**

Xwepêşandanên li Îran û Rojhilatê Kurdistanê ku zêdeyî 15 rojane tê domandin, tê de bi hezaran sivîl hatin binçavkirin û bi dehan jî hatine qetilkirin. Hêzên rêjîmê bi girtin û kuştinê hewl dide dawî li xwepêşandanan bîne û dengê gel bitepsîne. Ev xwepêşandan û serhildan ne ya yekemîne ku ji aliyê gel ve li dijî siyaset û zihniyeta Îranê tê pêkanîn. Serhildana jin a Jin Jiyan Azadî ku bi qetilkirina Jîna Emînî destpêkiribû, şop û bandora xwe li ser hemû gelan, jinan û bi taybet rêjîma Îranê kiriye. Xwepêşandanên gel li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê îradeya gel û nerazîbûna wan li hember desthilatdariyê û faşîzmê dide nîşandan. Li ser vê bingehê ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji Şoreşa Rojava piştgiriya dengê gelê li wê derê tê kirin. Têkildarî vê yekê Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê piştgiriya xwe bi hêza jin û ya azadîxwazan re ragihandin. Endama Meclisa Jin ya PYD’ê Hayistan Hesen û ji Kongra Îslama Demokratîk Evîn Hecî ji Rojnameya me re axivîn.

**‘Hemû gel, pêkhate û bawerî bi yek dengî li qadan e’**

Hayistan axaftina xwe wiha destpêkir: “Serhildana gel ya ku li Îran û Rojhilatê Kurdistanê hatiye destpêkirin, cihê rûmet û rêzdariyê ye. Ev gel bi sala ye di bin sîstemeke tund ya îslamî de jiyan dike. Rêjîma Îranê nefes li gelê xwe girtiye, bi polîtîkayên gelek zirav û hişk her gel xistiye bin metirsiya xwe de ku tu carî serî li hember rêjîm û sîstemê ramekin. Vê carê bi hilweşandina aboriya wan û rewşa zehmet yak u gel pê re rû bi rû ye, êdî sebra gel li hember van siyaset û zehmetiyan nema. Gel êdî bi yek dengî bê ferqa Kurd û Farisan û hemû pêkhate û olên din, serî li hember van polîtîkayan rakirin û daketin qadan. Weke ku em dibînin û dişopînin di nava van xwepêşandanan de, hêrseke ne normal ji aliyê gel ve derdikeve holê, ev yek jî ji tijîbûna gel û asta zordarî û dîktatoriya vê rêjîmê radixîne ber çavan. Ji ber vê yekê em van xwepêşandanên ji bo mirovahî û rûmetê ji dil de silav dikin.”

**‘Dengê me bi dengê wan re dibe yek’**

Hayistan di domdariya axaftina xwe de bal kişand ser serîrakirinên jinan di nava van xwepêşandan de û wiha anî ziman: “Ev hêrs û serîrakirina ku em di van xwepêşandanan de dibînin, divê em ji bîr nekin îlham û bandora xwe ji Serhildana Jin, Jiyan, Azadî ya ku muhra xwe li dîroka rêjîma Îranê xistiye werdigre. Serhildana bi heybet ku yekem car ji aliyê jinan ve tê rakirin di nava sîstemeke melayî û olperest bi vî awayî wê zû zû neyê jibîrkirin. Me dît ku çawa jin careke din cihê xwe di nava van xwepêşandan de digrin û dengê xwe bilind dikin. Bi taybet bi van xwepêşandanan re redkirin û rakirina sîstema cezayê ya darvekirinê hate kirin. Di tu serdemekî de heyanî niha bi vê hejmarê jin û gel nayê qetilkirin bi rêya darvekirinê, ev bi tena serê xwe serhildanek jê re divê. Ji lewra jinên serhildêr ji bo maf û azadiya xwe her wiha ji bo rakirina sîstema darvekirinê careke din hêza xwe li meydanên xwepêşandanan îsbat kirin. Em jî bi vê yekê re yekbûn û piştgiriya xwe ji wan jinan re çi li Rojhilatê Kurdistanê dibe çi jî li Îranê dibe, raber dikin û dengê xwe bi dengê wan re li hember rêjîmên mafxwar bilind dikin.”



Hayiştan Hesen


Evîn Hecî

**Xapandina gel bi olê**

Evîn Hecî da zanîn ku Îran bi zihniyeta Îslamî gelê xwe dixapîne û wiha pê de çû: “Îran bi ferizkirina zihniyeta Îslamî ya tund gelê xwe xistiye bin zextekeke pir zehmet de ku êdî bi her derbaskirina zagonekê re yan jî piratîkeke ne li gorî dewletê be wan bi navê îaslamê darve dike. Ev yek jî tê wateya bikaranîna ola Îslamê ji bo rewakirina sûc û cezayê xwe. Ji ber ola Îslama resen van nêzîkatiyan qebûl nake û em tu carî jî van piratîkan bi navê Îslamê qebûl nakin.

Di van deman de jî ji ber têkçûna aboriya wê êdî gel nema rewşa jiyanî ya zehmet qebûl dike. li hember van xwepêşandanan rêjîma Îranê hemû kiryarên dijmirovî li ser gel û jinan pêk anîn. Bê guman ev kiryar nayên qebûlkirin, ji ber ne tenê li ser gelê Îranê dikin li ser gelê Kurd ku ew jî di heman zehmetiyê re derbas dibin de, tên kirin.”

Evîn di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser serhildana gelê Kurd û jin li wê derê û wiha got: “Li kêlek van xwepêşandanan, serîrakirina gelê Kurd li hemû bajarên Rojhilat cihê rûmetê ye ku wan jî bi serîrakirina li hember van kiryar û sîstema dewletê, helwesta xwe ya serxwebûnê nîşan didin. Bi taybet rola jin di van xwepêşandanan de derbeyeke giran ji bo rêjîma Îranê ye, careke din tekez dikin ku îrade û denê jinên azad li meydanan vejîn dibe. Em vê sekna bi rûmet û îradeya jinên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ji dil silav dikin û em ê tu carî piştgiriya serhildanên jinan bernedin.”

## Ji Ramanên Jin



### Du taxên ku bi du welatan e

Bêrîtan Xalid

Heleba berxwedêr ku bi salan dijî her cûre êrişan li ser piyan ma îro di nava dorpêçê de ye, îro neyaran careke din çav berdaye wê taxan , her dixwazin çongê wî deynin , Heleba bi salan serî dijî her dagirker û desthilatan serî rakir îro birîndar e .Di sala 2012’an de berxwedaniyek bêhempa dijî çeteyên dagirker da meşandan û gelek berdêlên giran û buha da.Armanc ji wan êrişên dagirkerinê li ser gel û têk birina pergala Rêveberiya xweser bû , pergala ku bi serkêşiya jinan hat e birêvebirin . Bi salan xwestin di riya siyaseta xwe, wan taxan bifetisînin, dor li her dû taxan girtin, ew ji pêdiviyên jiyanî qut kirin , gef li wan xwarin. Jinên her dû taxan bi gotina em zarokên vê axanê û em bar nakin serî li hember êrişên berî niha bi salan û êrişên îro serî hildin. Bi kîn û şewateke ji dil dixwazin îro heyfê hilînin . Ev jî taybet piştî hilweşandina rejîma Baas ya netewperest û desthilatdariya wê ya ku 50 salan zêdetir li ser axa Sûriyê berdewam kir ku bi yek carê da bi hemû hêzên xwe yên leşkerî û saziyên xwe ve, xwe radestî komên çete yên girêdayi dewleta Tirk ya dagirker û HTŞ’ê kir. HTŞ’ê bajarên ku radest kiribû yek ji van bajarên kevnar û navdar bajarê Helebê bû.Em vê baş dizanin ku HTŞ’ê bajarên ku serwerî daye avakirin, bi hemû aliyan ve dide guhertin. HTŞ’ê dibêje “Alozî û gengeşeyên li tevahî Sûriyê ava bûne û dema desthiladariya rejîma Baas emê ji holê rabikin. Lê ev kiryarên niha li tevahî Sûriyê têne kirin, ji qirkirin û kuştinên ku li hemberî pêkhateyên herêmê diqewimin, piranî jî bi destê çekdarên HTŞ’ê tên kirin. Îro gefê li jiyana jinan dixwe, îro jinan bo siyaseta xwe xeter dibînin, ez niha çend mînakan bînim ziman bê çawa dixwazin navê jinan bidin ji bîr kirin , mi destpêkê got , beriya hilweşandina Rejîma Baas jî, li taxên Helebê bi taybet yên Kurd tê de jiyan dikin, Eşrefiyê û Şêx Meqsûd, bi pêşengtiya jinê modela xwe ya Rêveberiya Xweser xistibûn merîyetê. Lê piştî hatina HTŞ’ê li Helebê hewildide rola jinê paşguh bik e. Zanîngehên Helebê bi perwerde, bi şêwaz û rêbazên olî tên meşandin. Di dibistana de, beşên olî hatine zêde kirin. ji ber zayenda wê, ji pirtûkên dibistanan hate rakirin. Di encamê de tê xuyakirin ku kiryarên li hemberî jinê piştî hilweşandina rejîma Baas hîn zêdetir bûn e. Ji ber ku jinê mohra xwe li şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê xistibû û dixwazin bi wan kiryarên xwe vê yekê ji holê rakin. Dîmen û teqezkirina wan kiryaran ji aliyê welatiyan ve tê kirin. Bi jinên herêmê re cilên reş yên olî bi navê (Ebe) tê ferzkirin. HTŞ’ê û komên çete yên girêdayi dewleta Tirk ya dagirker hewildidin ku li Helebê hişmendiya rêxistinên di heman bîrdoziyê de Talîban û El Qaîde û DAIŞ’ê serwer bikin. Tê payin ku di erebeyan de, cihê zilam û jinê ji hev were cûdakirin.Îro li Helebê ji bilî van tiştan şerek tê kirin , şerê ku dixwazin gel ji wir bidin koçberkirin ku tenê li ger xwe nexşeya Sûrî xêz bikin .Gel û jinên herdû taxan bi yek gotinê gotin em hene û dibêjin em hene , Li hember hemû êrişan bi dil şewtî li dijî çeteyan bi hemû rêbazan xwe xwe bi rêxistin dikin , parastina xwe û tax û zarok û gelê xwe dikin , ji cîhanê didin xwûyakirin ku bi jinan wê welat werin avakirin , wê bi jinan hişmendiyan desthilatan li holê nemîne .

# Jinên Rojhilata Navîn têkoşîna zihniyeta sedsaliyê dikin

**Amara Baran**

**Rojhilata Navîn ku di nav kirîz û heviyê de ye, bi dîrokeke tije şer, pêvçûn û siyaseta xwe ya tevlihev tê nasîn. Di vê herêmê de rewşa jinan bi şert û mercên cîhêreng re têkildar e, ji şertên aborî û siyasî heta baweriyên civakî û çandî. Di deh salên dawî de, rûxmê şer û pevçûnan jî jin ji bo maf û azadiya xwe tê dikoşe.**

Di gelek welatan de jin hîn bi sînorên civakî yên ku wê tengav dike, re rû bi rû dimînin. Di hin deveran de jin nikarin bi awayekî azad di nav siyaset, kar û xebatan de cih bigrin. Zewaca bi zorê, tundûtîya malbatî, sînorkirina tevger û xwendinê hîn jî pirsgirêkên girîng in. Ev rewş pir caran bi têgihiştinên kevneşop a zilamê serdest li ser jin tê kirin.

Li aliyekî din jî li hin deveran jinan gelek destkeftiyên mezin bidest xistine ku mînaka wê jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi Şoreşa Rojava re ku bi “Şoreşa Jin” tê naskirin, gelek destkeftiyên girîng di aliyê perwerde, kar û siyasete de bi dest xistin. Jinên nivîskar, rojnamevan, çalakvan û siyasetmedar rolekî girîng di guherîna civakê de lîstine û dileyîzin. Tevgerên jinan û rêxistinên civakî bi dengê bilind li dijî tundî û nêheqiyên li ser jin û ciwanan tê kirin, radibin. Şer û pevçûnên ku di Rojhilata Navîn de diqewimin li ser jinan bandorên giran dikin. Di demên şer de, jin pir caran bûne qurbaniyên koçberiyê, tundûtijîya cinsî û xizaniya aborî. Bi vê re jî, di heman demê de, jin rolekî bingehîn di parastina malbat û civakê de lîstin û gelek jinên ku bi tekoşîna xwe bûne sembola berxwedan û hêviyê, mohra xwe li dîrokê xistin. Di encamê de, rewşa jin li Rojhilata Navîn ne tenê bi astengiyan, lê bi têkoşîn û berxwedanê jî tê nasîn.

Di gelek civakên cîhanê de, bi taybetî li herêmên ku şertên kevneşopî û siyasî hêzdar in, jin bi gelek kiryarên neheq re rû bi rû dimînin. Ev kiryar ne tenê mafên mirovî yên bingehîn binpê dikin, lê pêşveçûna civakê jî asteng dikin. Kiryarên ku li ser jin tê meşandin, dikarin di gelek qadên wek malbatî, civakî û aborî de derdikevin holê. Yek ji kiryarên herî belav tundiya li dijî jinan e. Ev tundî bi rêbazên, wek lêdan, zordariya derûnî, tehdîd an jî tundiya cinsî ne. Pir caran ev kiryar di nav malbatê de têne meşandin û di bin navê “pirsgirêkên malbatî” de têne veşartin ku ev yek şertên jinan zehmet dike.

Zewaca bi zorê û zewaca di temenê biçûk de jî ji kiryarên giran li dijî jinan in. Di van rewşan de jin bê ku maf û daxwazên wan werin guhdarkirin, têne mecburkirin ku di temenekî ewqas biçûk de bizewicin. Ev jî li ser derûnî û tenduristiya jinan bandoreke xirab û neyînî dike.

Herwiha, kontrolkirina jiyana taybet a jinan wek cil û berg, tevger, danûstandinên civakî û biryarên kesan e, yek ji awayên din ên tundiya zorê ye. Ev kiryar di bin navê “parastina namûsê” an jî “adat û kevneşopiyan” re têne rewa kirin, lê di rastiyê de azadiya jinê ne perwerdekirî û bê îrade hatiye hiştin, di bin baskên zilam de tê ragirtin.

Di encamê de em dikarin bînin ziman ku jin sedsal in têkoşîna zihniyeta mêr, dewlet û serdestan dike. Çiqasî ku rê li pêşiya jinê jî hatiye girtin, lê rêya berxwedaniya wê jî pêş ketiye. Di roja îro de jî asta têkoşîna jinê di astekî bilind de ye ku ne zihniyeta desthilatdar, ne qeydên malbatê ne jî kevneşopiyên civakî dikare dengê jinê bêdeng bike. Bi taybet jinên ku di xeta azadiyê de meşiyane îro çirûska wan li ser tevahî jinê Rojhilata Navîn û cîhanê vedide.



# Li cîhanê nêzî 54 milyon zarok di karên xeternak de dixebitin

Karkirina zarokan li ser asta cîhanê gihiştiye asteke bilind a metirsîdar, li gorî UNICEF'ê di sala 2024'an de di cîhanê de nêzî 138 milyon zarok di nava karan de cih girtine, ji xwendin û mafên zaroktiyê bêpar mane, di nava wan de 54 milyon zarok di karên xeternak de dixebitin.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Agahiyên herî dawî nîşan didin ku ji sala 2020’an ve hejmara karkirina zarokan di cîhanê de, zêdetirî 20 milyon zarokî bû. Di heman demê de, zarok ji mafê xwe yê jiyanê bê parin û di karên nebaş de tên karkirin. Lê belê çi qas hewldan tên kirin ku karkirina zarokan ji holê rabe. Lê berovajî vê yekê heta niha cîhan negihiştiye armanca xwe û karkirina zarokan ji holê ne hatiye rakirin.

Li gorî rapora nû ya UNICEF’ê, bi sernavê Kedkariya Zarokan, ku tevî pêşketinên li ser asta cîhanê tên kirin. Lê belê heta niha bi milyonan zarok jî, ji mafên xwe yên fêrbûn, lîstin, fêxweşiyê û hwd… bêparin. Di heman demê de, li ser asta cîhanê di kêmkirina hejmara zarokên ku neçarî kar dikin de pêşketinek mezin hatiye bidestxistin. Lê belê, hejmareke mezin ji zarokan di bazar, kargeh, nava zeviyan de kar dikin û gelek zarok neçar dibin ku karên herî xeternak bikin.

Rêveberê Giştî yê Rêxistina Navneteweyî ya Kedê, Gilîbirt F. Hongbo got ku encamên rapora wan hêviyê nîşan didin ku pêşveçûn mimkun e. Cihê herî guncaw û rast ji bo zarokan dibistanan e, lê ne bazar û cihê kar e. Di heman demê de, pêwîst e dê û bavên zarokan werin piştgirî û hêzkirin. Da ku zarokên xwe bidin xwendin û lêçûna şandina wan ji bo dibistanê bidin. Li şûna ku zarok were karkirin, da ku demara jiyana malbata xwe bike. Herwiha pêwîst e ku em di demeke nêz de çarseriyekê ji bo karkirina zarokan di cîhanê de bibînin. Da ku karkirina zarokanan di cîhanê de, jiholê were rakirin.



Li gorî raporên Amerîkaya Latîn her çend rêjeya karkirina zarokan di van çar salên dawî de neguheriye. Di heman demê de, hejimara giştî ya zarokên ku bandor bûne ji 8 milyonî daketiye 7 milyonan.

**Sedema karkirina zarokan**

Yek ji sedemên herî sereke yên karkirina zarokan, rewşa aborî ya xirab e. Ji ber vê yekê zarok neçar dimînin ku alîkariya mabata xwe bikin, nemaze ku qada perwerdeyê nayê kontrolkirin û qanûnên parastina mafên perwerdeyê yên zarokan neyên aktîvkirin.

**Welatên ku zarok tê de tên karkirin**

Li gelek dewletên cîhanê zarok tên karkirin û ji mafê xwe yên jiyanê yên bingehîn bê parin, mîna Afrîkaya Başûr, Sûdan, Misir, Urdin, Lubnan, Sûriyê, Îraq û hwd… Lê belê Afrîkyaya Başûr ku herî zêde zarok lê tên karkirin û bi qasî ji sedê 87 ji zarokan li vî welatî tên karkirin. Ji ber ku li Afrîkyaya zêdebûna nifûsê, pevşûn, xizaniya zêde û hwd… heye. Ev yek dibe sedem ku zarok ji mafên xwe yên bingehîn bêpar bibîne û herin kar bikin.

Karkirina zarokan, perwerdehiya zarokan lawaz dike, sûdwergirtina ji maf û derfetên pêşerojê yên wan sînordar dike û wan dixe xetereya zirar ya laş û derûnî de. Di heman demê de ev yek di encama xizanî û nebûna gihîştina perwerdehiya bi kalîte de ye, malbatan neçar dibe ku zarokên xwe bişînin kar. Herwiha çerxên bêpariyê di nav nifşan de berdewam in.

Rêjeya karkirina zarokan ji sala 2000’an vir ve nîv kêm bûye, ji 246 milyon zarokan daketiye 138 milyonî. Lê belê, rêjeyên karkirina zarokan niha di cîhanê de zêde ye.

**Hejimara karkirina kuran zêde tir e**

Di nava cîhanê de, hejimara karkirina kuran ji ya keçan zêdetir e. Karkirina bi darê zorê ya zarokan dibe sedem ku peşeroja wan ne ronî be û di warê kesayetî û derûnî de kesên çalak û saxlem dernekevin.

Lê belê herî zêde zarokên ku bê dê û bav kar dikin, da ku debara jiyana xwe bikin. Herwiha ji ber ku ev zarok kesekî wan nîne ku lêçûna wan an jî debara jiyana wan bike.

**Karkirina zarokan diyardeyeke xirab e**

Karkirina zarokan diyardeyeke xirab e, ji ber ku hemû xewn û xeyalên wan têk dibe û wan dixe rewşeke wisa ku hest bi zarokatiya xwe nakin. Divê mafên bingehîn ên zarokan bên garantîkirin û tundî li wan neyê kirin. Her malbatek ku destûrê dide ku zarokê xwe biçe ser cadeyan kar bike, binpêkirina mafê wane. Mezinkirina zarokan li ser malbatan ferze. Pêwîst e malbat ji bo debara jiyana xwe bi xwe bixebitin. Di heman demê de, divê zarok di nava jîngehek aram de jiyan bikin. Ne ku wek em dibînin ku ew bi destdirêjî û destdirêjiya seksî xwe re rû bi rû ne. Erkê dê û bavane ku jiyanek baş û guncaw ji zarokên xwe re peyda bikin.

**Ev sermeya zivistanê zarok li kolanan kar dikin**

Sermaya dijwar a zivistanê, berf, baran û heta germa havînê jî nekariye zarokên li kolanan kar dikin rawestîne. Ew qurbanê şer û malbatên xwene. Li gel vê li ser cadeyan bi gelek cûrên tundiyê re rû bi rû ne. Ji bilî vê ev zarok ji ber ku hin caran xwarinên bermayî dixwin, sîstema wan a tenduristiyê xirabûye. Pêwîst e saziyên parastina mafên zarokan bi erkê xwe rabin û rê li ber karkirina zarokan bigirin. Di heman demê de, jî pêwîst e hikumeta her dewletekê tedbîrên yasayî bigrin û li gel malbatan ji bo rêgirîkirina karkirina zarokan, belgeya sozdayînê îmza bikin. Dema zarok ji dayîk dibe divê xwedî sîgorta be, da ku malbat zarok neçar neke ku ji bo bidestxistina pêdawîstiyan rojane biçe ser cadeya û ji mafê xwe yê jiyanê bê par be.

# ‘Petrola Venezuelayê ji bo jîngehê metersiyê çêdike’

**Lîloz Hisên**

**Pisporên avhewayê hişyarî dan ku petrola Venezuelayê ji aliyê qalîteya xwe ve pir qirêj e û derxistina bi milyaran bermîl ji wê petrolê ji aliyê DYA ve wê krîza qirêjbûna avahewayê kûrtir bike.**



Trump ji bo petrola Venezuelayê anî ziman ku wê Venezuelayê 50 milyon bermîl petrol radestî wî bike û ew ê dahatê birêve bibe.

Li gorî CNN, Venezuela xwediyê rezervên petrolê yên herî mezin di cîhanê de ye, ku tê texmînkirin ku zêdetirî 300 milyar bermîl in, Trump nerînek pêşkêş kiriye ku li gorî wê kampaniyên petrolê yên Amerîkî dê bi milyaran dolaran bidin da ku berdewam bikin ku vî “zêrê reş” derxin.

**Petrola Venezuelayê ya herî qirêj di cîhanê de ye**

Pisporên avhewayê tekez dikin ku petrola Venezuelayê di nav yên herî qirêj ên di cîhanê de ye. Guy Prince, serokê lêkolîn, dabînkirin û enerjiyê li navenda lêkolînê ya serbixwe Carbon Tracker, got: “Petrola Venezuelayê ne ji ber sedemên îdeolojîk, lê ji ber sedemên têkildarî fîzîk û binesaziyê qirêj e.”

Petrola ku li Venezuelayê tê dîtin wekî petrola asîda giran tê binavkirin. Ew dişibihe qûmên petrolê yên Kanadayê, xwedî taybetmendiyeke ku bi qalindahiya xwe ya mezin û qalindahiya xwe ya viskoz tê naskirin. Li gorî cureyên din, rêjeyek bilindtir a karbona gaza serayê dihewîne û derxistina wê dijwartir e ku hewceyê enerjiyeke zêdetir e.

Lauren Stockman, rêveberê ku beşdarî lêkolînê li “Oil Shining International” dibe, rave kir ku ev petrol ji bîrê wekî şilek dernakeve, lê bi gelemperî divê bê germkirin di riya pompekirina dumana di nava bîran de.

Derxistina vê petrolê gelek enerjî û gaza xwezayî hewce dike ku dibe sedema germbûna gerdûnî. Ji ber rêjeya bilind a kibrîtê di vê petrolê de veguherandina wê wekî benzîn û mazotê dijwartir û bihatir dike. Di heman demê de hewceyî alavên taybet û zêdetir pratîk be, ku qirêjiya avhewayê zêde dike.

Li gorî agahiyên Ajansa Enerjiyê ya Navneteweyî nîşan didin ku emîsyonên mîtanê yên ji ber operasyonên kolandinê li Venezuelayê 6 qat ji navînîya cîhanê zêdetir in.

Li gorî pisporan, petrola Venezuelayê ji bo jîngeha derdorê metirsiyê çêdike, ji ber ku boriyên petrolê kevin û xirab in, ev yek jî îhtîmala rijandina petrolê zêde dike.

Lauren Stockman tekez dike ku çi li Kanadayê an Venezuelayê çênabe ku cûreya vê petrol bê derxistin.

# Êriş berdewam in, agirbest hat binpêkirin

Di 10'ê Adara 2025'an de di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û hikumeta demkî a Sûriyê de hevpeymanek ji 7 bendan pêkdihat hat îmzekirin. Yek ji xalên vê peymanê agirbestê bû, lê heya roja me ya îro agirbest pêknehatî.

**Aryen Hesen/Qamişlo**

Di 10'ê Adarê de di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk û hikumeta demkî a Sûriyê de peymanek ji 7 xalên sereke pêk tê ku di navbera Fermandarê QSD'ê Mezlûm Ebdî û serokê hikumeta demkî a Sûriyê Ehmed Elşer' de li Şamê hat îmze kirin. Ev hevpeyan bi armanca ku magê tevahî gelê Sûriyê were parastin, bi taybet mafê Kurdan were paran, agirbest li tevahî Sûriyê were îlankirin û hwd. Herwiha heya roja me ya îro ev peyman bi cihnehatine.

**Hin ji bendan lihevkirinê ev in;**

– Xala yekemîn ya peymanê li ser nûnertiya siyasî û beşdarbûnê ye. Li gorî vê divê hemû gelên Sûriyê di pêvajoya siyasî de werin temsîlkirin, cihê xwe di nava saziyên dewletê de bigirin û mafên wan bên misogerkirin. Lê li gorî vê xalê berpirsyariya herî zêde dikeve ser dewletê û desthilatê. Lê di hilbijartinan û amadekirina destûra bingehîn de jî, hate dîtin hêzên din yên Sûriyê li derve hatin hiştin û beşdarbûna wan hate astengkirin.

– Xala duyemîn ya peymanê naskirina mafên gelê Kurd e. Di vê mijarê de jî desthilata Şamê tu gav neavêt. Ti mafekî Kurdan nehate qebûlkirin. Newroz ku Cejna Neteweyî ya Kurdan e, 21'ê Adarê li Sûriyê weke rojeke fermî nehate qebûlkirin.

– Xala sêyemîn li ser tevahiya erdê Sûriyê pêkanîna agirbesê ye. Hêzên hikûmeta veguhêz qet li gorî vê xalê jî tevnegeriya. Komên çekdar ên desthilata Şamê li dijî Beravê, Siwêdayê û li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê êrişên xwe bê navber dewam kirin.

– Xala çaremîn derbarê entegrasyonê de ye. Li gorî vê xalê divê hemû saziyên leşkerî û sivîl beşdarî rêveberiya dewletê bibin. Derbarê vê xalê de QSD'ê û Rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, gelek caran daxuyanî dan, girîngiya vê mijarê û şêweyê pêkanîna wê nirxandin. Herwiha Hêzên Sûriya Demokratîk ji bo beşdarbûna nava artêşê lîsteyeke navên 50 fermandarên xwe jî pêşkêş kir. Destnîşankirin ku ew ji entegrasyona demokratîk re amade ne. Lê desthilata Şamê tenê di çarçoveya leşkerî de nêzîkî vê mijarê bû, xalên din ên peymanê hatin paşguhkirin.

– Xala pêncemîn derbarê vegera bi ewle ya koçberan de ye. Li gorî vê yekê wê bi awayekî bi ewle vegera hemû koçber û penaberên Sûriyê ya li ser cih û warên wan ji hêla dewletê de pêk were. Lê desthilata Şamê li gorî vê jî ti gaveke neavêt, li dijî dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê yên li Sûriyê jî tu helwest nîşan neda.

– Xala şeşemîn têkoşîna li dijî terorê ye. Lê di vê mijarê de heta niha tu gaveke şênber nehate dîtin. Berovajî wê çeteyên mîna DAIŞ'ê hê jî di nava artêşê de ne.

– Xala heftemîn derbarê redkirina cihêkarî û parçebûnê de ye. Desthilata Şamê ji roja destpêkê ve siyaseta parçekirina Sûriyê, cudakirina gel û pêkhateyên Sûriyê meşand. Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê dorpêç kir, rêyên di navbera Helebê, Reqa û Dêrazorê de girtin. Dîsa gotinên kîn û nefretê di nava gelên Sûriyê de bi pêşxistin.

Piştî îmzekirina peymanê çekdarên hikumeta veguhêz a Sûriyê 6 caran êrîş pêk anîn û piraniya wam êrîşan di roja yekem a îmzekirina peymanê de pêk anîn.

**'Binpêkirina hevpeymana 10'ê Adarê û 1'ê Nîsanê li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê'**





Li Taxa Şêxmeqsûd jî hêzên hikumeta demkî 3 bendên kontorlê yên nû li riya ketina taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê çêkirin. Endamên van bendan welatiyan radiwestînin û tevgera wan asteng dikin. Hemwextî vê tevgera çakdaran herdû tax Eşrefiyê û Şêxmeqsûd hatin topbarankirin. Di 6 Cotmehê de gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yê Helebê li hemberî dorpêçê bi sedan berê xwe dan satirên axî yên ku hikumeta demkî a Sûriyê ve hatine danîn û li hemberî girtina rêyan û dorpêçê xwepêşandan li dar xist. Li hemberî çalakiya gel, hêzên hikumetê jî bi gaza îsotê û panzêran êriş kirin, ji ber van êrişan gelek kes birîndar bûn.

Di 22'ê Kanûnê de ji aliyê hikumeta demkî ve êrîşeke giran bi ser taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de hat. Bi çekên giran êrîşî herdu taxan dikir. Herwiha bi awayekî belav û dijmirovî mala sivîlan bombebaran dikir. Bi awayekî hovane û bi çekên giran Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bombebaran kirin. Di encama vê êrîşa hovane yên li dijî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê de jinek şehîd bû Fedwa Mihemed El Kurdî (57) salî a ji pêkhateya Ereb şehîd bû, 19 sivîl û du endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn birîndar bûn. Ev jî binpêkirina peymana 1'ê Nîsanê ji bo herdu taxan ne û di heman demê de binpêkirin ji peymana 10'ê Adarê ya agirbestê re ye. Herwiha heya roja me ya îro dorpêç li ser taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yê Helebê berdewame.

**'Êrîşên li ser Bendava Tişrînê didomin'**

Di 9'ê mijdarê de komên girêdayî hikumeta demkî a Sûriyê girê Sîrya Tel û derdora Bendava Tişrînê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi çekên giran topbaran kir. Di 13'ê mijdarê de jî hêzên hikumeta demkî hewl dan bikevin gundewarê Bendava Tişrînê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Careke din çekdarên girêdayî hikûmeta demkî a Sûriyeyê di 30 kanûna 2025'an de êrişî derdora Bendava Tişrînê kir. Hat ragihandin ku êriş bi dronên kamikaze hatiye kirin û di encamê de zerarên madî çêbûn. çekên giran derdora avahiya li Bendava Tişrînê topbaran kir û di encamê de 3 şervanên birîndar bûne. Bi rageşiyek xeternak û berdewama siyaseta tevliheviya ewlehî û aramiyê, komên Sultan Murad, Sutlan Silêman Şah/Emşat û Hemzat ên girêdayî Wezareta Parastinê ya hikûmeta Şamê, bi 2 dronên xwekuj êrîşî avahiya derdora Bendava Tişrînê kirin. Careke din komên girêdayî hikumeta demkî a Sûriyê heman koman Girê Seyriatelê yê li derdora Bendava Tişrînê bi 2 dronên xwekuj hedef girtin, lê tu birîndarî çênebûn.

**Dêr hafir**

25'ê kanûnê de Li gorî agahiyên ji herêmê hatine wergirtin, komên hikumeta demkî a Sûriyeyê bi dronekê êrişî gundê Dure yê bajarê Dêr Hafirê yê kantona Tebqayê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir. Hat diyarkirin ku di encama êrişî de zarokek şehîd bû û kesek jî birîndar bû. Binpêkirinên hêzên hikumeta demkî a Sûriyê li derdora herêma Dêr Hafirê dewam dikin. Ji destpêka Tebaxê heta nîvê Cotmeha 2025'an, 8 kes ku 4 jê zarok in, şehîd bûne û 9 kes, 4 jê zarok, birîndar bûne. Di 2'yê Tebaxê de, komên çekdar ên hikumeta demkî careke din bajarê Dêr Hafirê topbaran kir. Di 11'ê Îlonê de, komên çekdar hewl da bi bikevin herêmê, lê QSD'ê ev hewldan têk bir. Di 20'ê Îlonê de gundê Um El Tîna hat topbarankirin, komên çekdar bi balafirên bêmirov malên sivîlan hedef girtin, di encamê de 8 sivîl, şehîd bûn û 4 kesên din jî birîndar bûn. Di 23'yê Îlonê de, hêzên hikumeta demkî bi 2 dronên xwekuj êrişek li ser cihekî QSD`ê yê li Dêr Hafirê pêk anî, piştre ketober gundê Zubayda topbaran kir, di encamê de 4 zarok birîndar bûn. Di 5'ê Cotmehê de, rêya Dêr Hafir û derdora wê bi dronên xwekuj hate bombebarankirin, di encamê de sivîlek birîndar bû. Di 10'ê Cotmehê de, komên girêdayî hikumeta demkî êrişên hewayî û topbaran li ser heman deverê pêk anî, di encamê de tu ziyan çênebû.Di heman rojê de QSD'ê ragihand ku çekdarên hikumeta demkî li Dêrazorê êrişî noqteyên wan ên li rojhilatê bajar kir. Di encamê de şervanekî QSD'ê şehîd bû û 7 jî birîndar bûn.

**Derbasbûna QSD'ê ji Şamî re**

Di 4'ê Çileya 2026'an de Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mazlûm Ebdî, Endamên Fermandariya Giştî ya QSD'ê Sozdar Hacî û Sîpan Hemo derbasî Şamê bûn. Piştî bi dawîkirina hevdîtinê raghandina QSD'ê diyar kirin ku ji bi pêkanîna 10'ê Adarê wê nîqaş û hevdîtin berdewambikin.



# Rêber Apo sazûmankarê azadî û aştiyê ye

Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê li bajarê Dêrikê Ciwan Hesen diyar kir ku Rêber Apo ji bo gelê Kurd û tevahî gelên azadîxwaz sazûmankarê azadî û aştiyê ye, azadiya civakî bi azadiya Rêber Apo pêkan e.

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Rêberê Apo ji bo pêşî li pêvajoyeke nû veke di 27'ê Sibata 2025'an de Banga Aştî û Civaka Demokratîk kir û piştî bangê jî Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê gelek gavên dîrokî avêt û bi erka xwe ya serdemê rabû. Di heman demê de peyamên Rêber Apo li Kurdistan, Rojhilata Navîn û tevahî cîhanê deng veda, lê heta niha jî ji bo serxistina pêvajoyê dewleta Tirk tu gavên berbiçav neavêtine û Rêber Apo ku mîmarê pêvajoyê ye hîn di bin tecrîde de hgirtî ye.

**'PKK'ê erkê ku ket ser milê wê pêk anî'**

Ciwan Hesen da zanîn ku ev nêzî salekê ye Rêber Apo pêvajoya Aştî û Civaka Demokrat daye destpêkirin, pêvajoyê jî gelek guhertin bi xwe re anîn û wiha got: "Di milê tevgera azadiyê de gavên dîrokî û girîng hatin avêtin, yekemîn banga Rêber Apo bû ya duyem jî sekinandina şer, li kêlek wê girûpek Gêrîla wek sembolîk çek şewitandin, di dawiyê de jî girûpekî daxuyanî dan ku xwe ji çiyayên Bakurê Kurdistanê vekişînin çiyayên Başûrê Kurdistanê. Tevgera Azadiyê erkê ku diket ser milê wê pêkanîn, niha jî pêwîst e dewleta Tirk gavan pavêje lê mixabin heya niha tu nîşanên erênî ji bo gavavêtinê nedaye û xwe bêdeng dihêle. Bi vê yekê isbat dike ku ew neqasî biryarên xwe ye û tu kes baweriya xwe bi wê nayîne. Li ser vî esasî Rêber Apo bi israre ji bo vê pêvajoyê bike xeta qanûnî û siyasî de û pirsgirêka gelê kurd li herçar parçeyên Kurdistanê bikeve riya çareseriyê de û aramî û aştî belav bibe."



**'Azadiya Rêber Apo azadiya gelan e'**

Hesen berdewamî da axaftinên xwe û wiha got: "Gelek pirs di serê mirov de çêbibin, dema ku pêvajo dest pê kir dewleta Tirk guhertin di axaftinên xwe de çêkir lê di piratîkê de tu gav neavêtin. Rêber Apo hîn dibin tecrîdê deye û hemû siyasetmedarên kurd di zindanan de rewşa wan nediyare. Niha jî em derbasî sala 2026'an bûn, ji vir û şûnde eger tecrîd neyê rakirin, em bi goman in wê çawa ev pêvajo birêve biçe heger gav yek alî bin. Li ser vî esasî dewleta Tirk ji bo rewşa Rêber Apo û tecrîda ku heyî gav neavêje û mafê hêviyê pêk neyîne û hemû beşên ku bi pêvajoyê ve girêdayî, ne heman nêzîkatiyê be, tê wateyê ku ev pêvajo wê neyê berdewamkirin. Di heman demê de gelê Kurd hemû xwedî yek helwestî ne ku pêwîst e tecrîd were şikandin û mafê hêviyê pêk were û Rêber Apo bi xwe vê pêvajoyê birêve bibe û fîzîkî di nav gel de be."

**'Pêvajoya Aştî û Civaka Demokrat çareseriya siberojê ye'**

Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê li bajarê Dêrikê Ciwan Hesen di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Ev 27 sal in ku dewlet û dijminên gelê Kurd dixwestin ku hemû girêdanên gel bi Rêber Apo re ji holê rakin, lê heya roja îro nekarîn tu guhertinan çêbikin û gel bi hemû îradeya xwe ve li ser xeta Rêber Apo ne. Di pêvajoya aştî û civaka demokratîk de êdî erkek û berpirsiyartiyeke deha zêdetir dikeve ser milê gelê me ku bi çalaktir xwedî li Rêber Apo û xeta şehîdan derkevin. Îro ji me tê xwestin ku em hemû bi yek helwestê di milê rêxistinî û yekîtî de xwe xurt bikin. Tê dîtin ku rojeva cîhanê bi giştî pêvajoya Aşitî û Civaka Demokratîk e, lewma piştgirtiya vê pêvajoyê erkeke li ser milê me ye. Em di wê baweriyê de ne ku wê ev pêvajo bi vê îradeyê wê bi ser bikeve. Dewleta Tirk jî neçare xwe biguhere da ku welatekî demokratîk û bi hêz ava bibe."

# Bandora şerê Sûdanê li ser Jinan

**Viyan Egîd/Qamişlo**

**Piştî ku asta şer û pevçûnan li Sûdanê bilind bû, koçberî û windabûna mirovan jî zêde bû, bi taybetî ya ku bûye qurban jî jin e. Jinên Sûdanê ne tenê qurbaniyên şer in, lê bûne şahidên rastîn ên têkçûna civakî û aboriya welatê xwe.**



Şerê dijwar yê li Sûdanê zêdetirî 2 salan e jiyana bi milyonan kesan xistiye bin tarîtiyê, lê herî zêde vî şerê xwîndar bandor li ser jinê kiriye, ji ber ku ew rû bi birçîbûn, koçberî, nebûna xizmetguzariyên bingehîn rûbirû dimînin û tundûtûjiya zayendî jî xirabtir dibe, jinên Sûdanê di encama şerê berdewam de rastî gelek trajediyan hatin, di nav de koçberî û windakirina debara malbatê. Lê belê êşa wan li wir bi dawî nabe, ji ber ku ew rastî binpêkirinên giran hatin, di nav de tecawiza Hêzên Piştgiriya Lezgîn û komên hevalbend li herêmên ku di bin kontrola wan de bûn. Tevî van zehmetiyan jî, gelek kes hemfikir in ku jinên Sûdanê roleke bingehîn di bidestxistina aştî û berpirsiyariyê de li welêt dilîzin.

**Sûcên li hemberî jinên Sûdanê**

Şerê ku li Sûdanê di salên dawî de derketiye holê, bandoreke pir giran li ser jiyana sivîlan, bi taybetî li ser jinan kiriye. Sûdan welatekî ye ku bi rêzekî dirêj ji şertên ne îstîkrarî, şer û pevçûnên navxweyî re dijî. Şerê dawî şertên jiyanê bi giştî xirab kiriye, lê jin bi taybetî bi gelek astengiyan re rû bi rû mane. Ev rapor armanca xwe li ser ronîkirina awayên ku şer jiyana jinan bandor kiriye hatiya hazir kirin. Li bajarên wek Xertûm, Darfur û Umdurman, jin di nav şertên ku ewlehî tê de tune ye dijîn. Tundîya cinsî, destdirêjî û zewaca bi zorê ne. Rêxistinên mafên mirovan hîn jî hişyar dikin ku gelek bûyer bi awayekî fermî nayên tomarkirin, ji ber ku qurbaniyên wê ji tirs û şertên civakî bêdeng dimînin.

**Koçberî û rewşa tenduristiyê**

Şer şertên ewlekariyê bi awayekî giran xera kiriye. Jin bi tundîya cinsî, destdirêjî û tacîzê re zêdetir rû bi rû dimînin. Di şertên koçberî û penaberiyê de parastina jinan pir kêm e, ku ev şertên xeternak zêde dike. Koçberî û Penaberî, gelek jin bi zarokên xwe re ji mal û welatên xwe dûr bûne. Di kampan de ni şert û mercên giran re derbas dibin. Di kampan de kêmbûna avê, xwarinê û xizmetên tenduristî jiyana wan hîn jî dijwar dike. Her wiha sîstema tenduristiyê ya Sûdanê bi awayekî mezin têk çûye. Jinên di demê zayînê de gihîştina xizmetên tenduristî nekin, ev rêjeya mirina dayikan bilind kiriye. Nexweşiyên ku bi şertên şerê ve girêdayî ne, bi taybetî di nav jinan de zêde bûne.

**Perwerde**

Şerê Sûdanê bi rêjeyekî mezin têkçûna jinan nîşan dide, lê pêwîst e her hêz îradeya wan derkeve pêş.pêwîst e ku nûçeyan ne tenê li ser şer û siyaseta leşkerî were çêkirin û rawestin, lê jiyana rojane ya jinan wek pîvana rastîn a qebûlbûna mirovî ya vê şerê binirxînin. Her wiha girtina dibistanan û şertên koçberî perwerdehiya jinan bi taybetî bandor kiriye. Gelek jin ji fêrgehê dûr ma ne û ewlehiya wan li ber zewaca bi zorê ye. Jin bi depresyon û stresê yên dirêjdem re dijîn.

**Bêdengkirina jinan û tundiya cinsî**

Şerê Sûdanê ne tenê pevçûnek leşkerî ye, lê encama şertên siyasî yên dirêjdem e, têkçûna desthilatê sivil, xwestinên leşkerî û destwerdanên derve. Di vê çarçoveyê de, jin bûne qurbanên şert û mecên ku li ser wan tu kontrol tune ye, di heman demê de li ser jiyana wan biryarên giran tên standin bê ku dengê wan were bihîstin.

**Jin û zarokên keç tên revandin**

Darfûra li rojavayê Sûdanê, ji sala 2003'an heta niha di nava şerên ku jin êşê bikşînin de ne. Bakurê Darfûrê jî piştî artêş ji baregeha Nyala vekişiya, ji Cotmeha 2023'an heta niha di bin kontrola Hêzên Piştgiriya Lezgîn de ye. Ev rewş binpêkirinên mafan ên li Darfûrê xirab kir. Di nava welat de kampa Zamzam ku ji bo kesên ji cihên xwebûne ava kirine, jin têkildarî binpêkirinên ku lê rast hatine de bi sedan çîrokan vedibêjin.

Rojnamevanî ya navneteweyî pir caran li ser şer wek lîstika hêzên leşkerî rawestiya û jiyana sivîlan bi taybetî ya jinan di paşperdeyê de maye. Li gorî raporên mafên microvan, tundiya cinsî ne bûyerên fermî ne, lê li hin herêman wek amûra şer tê bikaranîn. Ev şert ne tenê jinên qurban têk dibe, lê civakê bi tevahî têk dibe, ji ber ku şertên tirs û şermê dengê wan bi tevahî qut û dikujin. jinên ku di şertên şer de mezin dibin, nifşekê nû yê têkçûyî pêk tînin. Qutbûna perwerdehiyê, zewaca zû û trawma şertên wan ên pêşerojê têk diçe. Ev jî ne tenê pirsgirêka roja îro ye, lê xeter e ji bo pêşeroja Sûdanê.

**Rolên jinan û berxwedan**

Tevî şert û mercên zor, gelek jin di şertên şer de rolek girîng di berxwedana civakî û alîkariya mirovî de leyistin. Ew torên piştgirî çêdikin û ji bo parastina malbat û civakê di xebetin. Her wiha tevî şertên tarî, jinên Sûdanê ne bêdeng in. Hin jin rêxistinên biçûk ên civakî avakirine, hin jî bi nivîs, gotin û karê mirovî dengê civaka xwe dighînin derve. Ev berxwedaniya rojane, her çiqas biçûk xuya bikin jî, lê bingehên jiyanê diparêzin. Ji ber vê yekê pêwîst e parastina jinan di şertên şer û koçberiyê de were zêdekirin. Her weiha xizmetên tenduristî û perwerdehî bi taybetî ji bo jinan were piştgirîkirin. Di heman demê de bernameyên piştgiriya derûnî û aborî werin pêşxistin. Jinên Sûdanê ne tenê li benda alîkariyê ne, lê belê ew li benda bihîstina rastiyê ne ku her dewletek edî mafên wan bide.

# 'Heta destê Tirkiyê di Sûriyê de hebe çareserî zehmet e'

Endamê Desteya Rêveber a Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk Kurdiyar Dirêî diyar kir ku Tirkiyê siyaseteke pir xerab di hundirê Sûriyê de da meşandin û hîna jî ev siyaset berdewam e, lewra heta destê Tirkiyê di Sûriyê de hebe, çareseriya Sûriyê zehmet e.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Derbarê gefxwarina dewleta Tirk li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê û giştî Sûriyê, endamê Desteya Rêveber a Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk Kurdiyar Dirêî bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Dewleta Tirk her dem Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ser xwe weke gef dihesibîne, lê di rastiyê de ew bi xwe gefan li ser herêmê dixwe, hûn vê siyaseta dewleta Tirk çawa dinirxînin?**

Nerîna Tirkiyê ya ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke gefeke mezin li ser xwe dibîne, ew girêdayî avabûna Komara Tirkiyê bi xwe ye. Tirkiyê di 1923'an de piştî Peymana Lozanê weke dewleteke çêkirî, hat avakirin. Zihniyet, stratîjî û siyaseta da meşandin, ew bû ku dewleta Osmanî ji ber gelek netew, pêkhate, ol û mezheb di nav de jiyan dikirin, hat hilweşandin. Lewra ji bo Komareke Tirkiyê ya xurû ava bike ku neyê ber hilweşînê mîna dewleta Osamanî, pêwîst e pêkhate û gelên di nava sînorê Tirkiya çêkirî de, qir bike û her cûre siyast bide meşandin ku xwe ji doza Kurdî rizgar bike. Ji ber wê serkeftina gelê Kurd weke tunekirina Komara Tirkiyê, hisab dikir. Ji wê demê û heya roja îro wê siyaseta da meşandin jî ewbû ku şerê destkeftiyê gelê Kurd li çi deverê dibe bela bibe û rê li ber bigre, me dît jî ku çawa mudaxeleyî Başûrê Kurdistanê, siyasetên Rojhilat û Rojava dike, hem jî gelek peyman bi dewletên dagirkerên Kurdistanê re danî.

Tirkiyê hebûna gelê Kurd nebûna xwe dibîne. Di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de piştî Şoreşa Sûriyê, di 2012'an de Şoreşa 19'ê Tîrmehê hat meşandin, Tirkiyê di nava Şoreşa Sûriyê de dixwest "Mîsaqa Milî" pêk bîne ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagir bike, herwiha wiha Başûr Kurdistanê. Hem jî xwena jinûve avakirina dewleteke Osmanî di bal û xeyala wê de bû, lê pêşketina Şoreşa Rojava bû dîwar û astengek li pêşiya wê. Di heman demê de pêşketina ku hêzên YPG, YPJ'ê pêk anîn û berfirehiyeke mezin ji axa Rojava rizgar kirin, Tirkiyê xiste nava metirsiyê de ku piştî hêzên QSD'ê bi alîkariya kiwalîsyona navnetewî çeteyên DAIŞ'ê têk biriye, piştî bidawîbûna şer, bêguman wê Rojavayê Kurdistan were avakirin. Ji bo Tirkiyê didît ku heger herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rojava ava bibe û hemû pêkhate di nava de, di bin ramanên Rêber Apo de weke netewa demokratîk, biratiya gelan û mafê jin, ev wê bibe teysandineke mezin li ser Bakurê Kurdistanê ku Tirkiyê neçar bike, ew jî doza Kurdî bipejirîne û çareser bike. Ji ber vê yekê her dem Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke metirsî li ser hebûn û têkbirina projeyên xwe dîtiye. Lewra gefan li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixwe mîna ku ew parçak ji Tirkiyê ye, yan jî Serokê Tikriyê Serokê û Wezîrê Karê Derve yê



Tirkiyê yê Sûriyê ne. Ev sedemên ku Tirkiyê gefan li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixwe.

**Rêber Apo di nameya xwe ya sersalê de behsa Peymana 10'ê Adarê kir û tê de got; Pêwîst e Tirkiyê ji bo Sûriyê roleke çêker bilîze, lê piştî nameyê û heya niha gef û êrişên Tirkiyê zêdetir bûne, hûn vê çawa şîrove dikin?**

Banga Rêber Apo ji bo ku Tirkiyê roleke çêker di Sûriyê de bilîze, ew girêdayî banga Aştî û Civaka Demokratîk e. Piştî bûyerên ku di 7'ê Cotmeha 2023'an de li Xezayê rû da û Îsraîl piştî vegerandina êrişa Hemasê diyar kir ku ew ê rûyê Rojhilata Navîn biguherîne, herwiha Netanyahu jî diyar kir ku Kurd weke dostên wînî xwezayî ne, ew ê piştgiriya kêmnetewan bike û rûyê Rojhilata Navîn biguherin, van bûyeran gelek metirsî di hundirê Tirkiyê de çêkir. Tirkiyê bi xwe hîz dikir ku piştî lewazkirin û lêdana baskên Îranê di deverê de, wê dor were ser wê û wê Îsraîl di hundirê şikendandina Tirkiyê bi xwe de jî bilîze. Ji ber Îsraîl diyarbû ku ew serkêşiya Rojhilata Navîn dike bi piştgiriya Amerîka.

Di heman demê de di Tirkiyê de doza Kurdî heye, Tevgera Azadiyê pir pêş ketiye, çêndî operasyonên leşkerî dan meşandin li hemberî tevgerê, lê nikarîbûn wê ji holê rake. Ji ber vê metirsiyê Tirkiyê dizanîbû ku di Rojhilata Navîn de guhertin hene, ew guhertin ji nû ve dîzayînkirina Rojhilata Navîn be, Tirkiyê jî jê ne cuda be. Lewra ji bo rêgirtina li ber hilweşîna dewleta Tirk an jî ji bo metirsiya ji perçebûnê, Bexçelî bang li Rêber Apo kir, ji bo dîsa bikevin muzakereya aştiyê li Bakurê Kurdistanê. Tirkiyê ne ku ji bo şer rawestîne yan jî xwîn gelek hatiye rijandin kete vê bangê de, lê ji metirsiya hebûna xwe weke dewleta Tirkiyê ew bang hate kirin.

Rêber Apo jî proeya wî avakirina civak û konfedralîzma demokratîk li Tirkiyê û li Rojhilata Navîn e, bi rengekî aştiyane ku dûrî xwîn, şer û pevçûna ye. Rêbertî dixwaze krîzan tune bike, ji bo wê projeya Aştî û Civaka Demoratîk da meşandin. Di nava vê projeyê de weke ku rêbertî jî diyar kiribû ku; "Rojavayê Kurdistanê xeta min a sor e" dema Rêber Apo vê dibêje tê wateya ku çi êrişeke Tirkiyê li ser Rojavayê Kurdistanê were kirin, tê wateya ku proseya aştiyê têk diçe. Lê dewleta Tirk, dewleteke netewpereste, li ser zihniyeta tunekirina gelê Kurd ava bûye. Lewra jî gavan pir dereng diavêje, ew bendeware ka wê di Rojavayê Kurdistanê de çi bibe, çareseriya di Sûriyê de çi be, wê teyisandina wê li ser projeya aştiyê jî bibe. Ji bo wê me dît Tirkiyê di demên berê de gelek propaganda kir ku got, Rêber Apo dixwaze QSD'ê çekê xwe deyîne, tevlî artêşa Sûriyê bibe, fedralî û nenavendiyê nexwaze. Lê ev hemû hat eşkerekirin piştî serdana lawê birayê Rêber Apo, Omer Ocalan ku got; Rêber Apo dibêje pêwîst e QSD'ê çekê xwe daneyîne, ji ber rewşa Sûriyê ne mîna rewşa Tirkiyê ye. Herwiha banga aştî tenê ji bo Partiya Karkerên Kurdistan e, ne ji bo hêzên QSD'ê ye, lê Tirkiyê dixwaze vê propogandayê bike ku hemî bi hev ve girêdayî ye û Hêzên Sûriya Demokratîk bê çek bike. Lewma di nameya sersalê ya Rêber Apo de ku dibêje; Tirkiyê roleke çêker bilîze di Sûriyê û peymana 10'ê Adarê de, ew zelale axiviye ku ji Tirkiyê re dibêje pêwîst e tu peymana 10'ê Adarê asteng neke, herwiha tu nebe weke pêşgirê hikumeta demikî li hemberî QSD', tersî wê jî heger nakokiyên te hene, pêwîst e tu bi Rêveberiya Xweser re bikeve nava danûstandinan de.

Lê çima Tirkiyê naxwaze di Sûriyê de Peymana 10'ê Adarê bibe çêker, ji ber ew dibîne çi çareserî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û di sîstema Sûriyê de bibe, wê teysandina wê li ser Bakurê Kurdistanê hebe. Lewma heta roja îro pir zextê dike, dixwaze peymana 10'ê Adarê ji wateya wê derxîne, QSD'ê têxe lewaziyan de, piştgiriya hikumeta demikî dike ji bo Şam li hemberî Rêveberiya Xweser êrişeke leşkerî jî bike. Lê rewş siyasî hatiye guhertin, ne roniya kesk ji dewletên mezin weke Amerîka û Rûsiya heye ku êrişeke wiha pêk were, ne jî di proseya aştiyê de jêre derfetê heye ku ew bi xwe rasterast mudaxele bike weke demên berê.

**Gelo rola Tirkiyê di Sûriyê de roleke çawa ye, rola wê ya erênî û neyînî çi ye?**

Eger Tirkiyê bi erênî derbasî Sûriyê biba, wê ewqasî krîza Sûriyê dirêj nekira û wê ewqas qurbanî jî çênebiba. Lê mixabin mudaxeleya Tirkiyê ji bo Sûriyê tu carî aliyê erênî nehatiye dîtin, her dem neyînî bû. Ji ber piştî şoreşa Sûriyê hat lidarxistin, Tirkiyê di rêya ixwan El-muslimîn û tevgerên siyasî de mudaxeleyê Sûriyê û gelek deverên din kir û ket bin wê hewa hanê de ku derfet jêr hatiye, hem dewleta Osmanî û welatê Şîn ku bi nav dike, hem jî mîsaqa milî pêk bîne. Ji ber wê mudaxeleya wê di Sûriyê de ji bo berjewendiyên wê bûn, ne ji bo gelên Sûriyê bû. Tiştê ku teysandina mudaxeleyan Tirkiyê çêbû ya yekemîn ew bû ku berê Şoreşa Sûriyê guhert. Kesên serkêşiya şoreşê kirin di destpêkê di bin navê artêşa Azad, hemû hatin tesfiyekirin an jî hatin girtin û dûrxistin, ji nava tevgera li Sûriyê. Kesên hatin pêşxistin jî, kesên îslama siyasî ya tundrew, ixwan muslimîn û di demên pêş de rasterast piştgiriya DAIŞ'ê kir. Ji ber wê mudaxeleya wê mudaxeleyeke neyînî bû. Ya duyemîn jî Tirkiyê siyaseta guhertineke demografîk li Sûriyê da meşandin. Ya seyemîn jî ew destkeftiyên mûxalefeta Sûriyê ku karîbûna rejîma Esed hilweşandiba, Tirkiyê nehişt ku rejîma Sûriyê were hilweşandin, ji ber wan ne dixwest sîstemeke demokratîk were, lê dixwesetin sîstemeke ixwan muslimî girêdayî berjewendiyên Tirkiyê be. Tirkiyê siyaseteke pir xerab di hundirê Sûriyê de da meşandin û hîna jî ev siyaset berdewam e. Di aliyê erênî de tiştê ku Tirkiyê kir, ne di xizmeta gelên Sûriyê de, di berjewendiya hêzên ku dixwazin Rojhilata Navîn biguherînin, nexşe û dîzayîneke nû bidin Rojhilata Navîn de bû. Mudaxeleya wê jihevxistina civakan, lewazkirina dewletan û gurkirina şer bû.

**Astengê li pêşiya pêkanîna Peymana 10'ê Adarê dewleta Tirk e, lewra ger ew çareseriyê ji bo Sûriyê dixwazin, pêwîst e çi bikin?**

Derbasbûna HTŞ'ê di Şamê de Tirkiyê weke serkeftine mezin ji xwe re dît. Tirkiyê dixwest piştî HTŞ'ê kete Şamê de lingê wê xurt bike û rewabûneke navnetewî jêre bistîne, herwiha serdestiya xwe dîsa li ser Sûriyê tevahî belav bike. Astengiya li pêşiya wê dîsa derket Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Hêzên QSD'ê bû. Di wê demê de jî me dît HTŞ'ê berê xwe da gelên Elewî û Durzî li dijî wan komkujî pêk anî, ji bo rêgirtina li komkujiyan û rêgirtina li ber şerekî navxweyî ji nû ve, Hêzên QSD'ê wan jî îmzeya Peymana 10'ê Adarê kir. Tikriyê jî ew peyman pijrandibû bi armanca ku HTŞ'ê diyar bike ku vaye dixwaze pêkhateya di nava xwe de vehewîne, amadeye ji danûstandina re, dixwest wê dema kurt derbas bike ku lingê HTŞ'ê di Şamê de xurt bike. Lê nêzîkatiya Tirkiyê ji vê peymanê re ewbû ku di nava demê de di bin zext, dorpêç û girtina erêkirina navneteweyî ku roniyeke kesk bistîne ku karibe zextê li QSD'ê bike, da ku ji hev bikeve û weke kes tevlî artêşa Sûriyê bibe. Herwiha Kurd bi hin destkeftiyên biçûk weke mafê hin aliyan de razî bike. Tirkiyê armanca wê ji Peymana 10'ê Adarê tu carî ne çareserkirina krîza Sûriyê bû, ya rastî vala derxistina Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû. Di milê din de jî Hêzên Sûriya Demokratîk di aliyê diplomasî, leşkerî, danûstandin û projeya xwe demorkatîk de karîbû xwe li ser asta Sûriyê feriz bike û ew daxwzên Tirkiyê nepijardiye. Lewra çi dema rûniştin û danûstandin çêdibe, hikumeta demikî naxwaze xalên peymanê pêk bîne, sedemên wê jî mudaxeleya Tirkiyê ye. Ji ber kesên girêdayî istixbara Tirkiyê di nava hikumetê de pir xurtin naxwazin wan xalan weke hatiye îmzekirin pêk bîne. Lê weke Tirkiyê dixwaze pêk bîne. Heta destê Tirkiyê di Sûriyê de hebe bi vê xurtbûnê di nav hikumeta demikî de, wê gelekî zor be ku Peymana 10'ê Adarê pêk were.

FENER



## Çima Berxwedana Şêxmeqsûd û Eşrefiyê?

**Idrîs Henan**

Piştî guhertina destê desthilatiya li Sûriyê û navê Baas kirin HTŞ, heman demê taybetmendiyên rejîma berê jî lê bar kirin. Lew re jî, bê hesab û kîtab, demildest tişta ku Esad piştî 50 salî kiriye, wan ji roja yekem ve kirin û berê xwe dan Beravê. Lê em ji bîr nekin ku paralelî qaşo hemleya rizgarkirinê, xwestin li Şehbayê li dijî koçberên Efrîn û niştecîyên Şehbayê komkujiyan pêk bînin û nasnameya xwe ya qirker di bin navê fermiyetê de îlan bikin. Lê diyar e ku terazuyên li ser erdê û hebûna hêza QSD rê neda ku ev komkujî pêk were. Yanê zemîna wê ne amade bû. Piştî ku derbasî qesrê bûn, berê xwe dan Elewiyan û li Beravê, li ber ruyê tevayî cîhanê komkujiyên giran pêk anîn. Heyama navneteweyî jî ji vê yekê re hazir bû û ti kesekî dengê xwe nekir. Elewî xapandin û çekên wan ji dest birin, çeteyên xwe jî berdanê. Ji bona ku rê li ber vê komkujiyê were girtin û şerê li Sûriyê bi guhertina Esad re were rawestandin, peymana 10 Adarê weke altirnatîfa şer hate ragihandin. Lê dem pir naçe û berê xwe didin Siwêdayê û li dijî Dirziyan komkujiyê pêk tînin. Lê Siwêda ne wek Beravê bû û derhal Îsraîl mudexele dike û piştgiriyê dide Dirziyan. Bi vî awayî jî dikevin bin sîwana parastina Îsraîlê û çeteyên Şam û Tirkiyê paş ve dikişin. Ji wê rojê û vir ve, planên qirkirina Kurdan bi serperştiya Tirkiyê datînin û li dijî hinek herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û texên Kurdan li Helebê diceribandin. Bi vî awayî jî konsepta qirkirina etnîkî bi talîmatên Tirkiyê xistin meriyetê û li benda şert û mercên navneteweyî yên pêwîst bûn. Destpêkê ambargo avêtin ser taxan û makîneya dezinformasyonê dan şixulandin. Ji bo piştgiriya siyasî jî, pereyên hinek dewletên kendavê ketin dewrê û hemû informasyona xwe xistin seferberiyê ku taxan û gelên wan reş bikin, êriş û komkujiyan jî rewa bikin.

Bi hatina 6 Çileya 2026`an, civîna li Parîsê navbera Îsraîl, Sûriyê û Amerîka de hate lidarxistin. Di civînê de hikûmeta HTŞ beşek axa Sûriyê bexşî Îsraîlê kir û weke tawîz destûra qirkirina Kurdên li Helebê wergirtin. Hîç dem nedayê û hîna waliyê Tirkiyê, Şîbanî li Parîsê bû, fermana paqijiya nijadî li dijî Şêx Meqsûd û Eşrefiyê da. Colanî hîç ji meselê derxistin û hinek hîkayeyên vir de û wê de belav kirin û bi şer û êirşan re, rojeva firotina axa Sûriyê nixumandin. Ji bona wê jî kêlî bi kêlî bi hezaran derew belav kirin û raya giştî ya Sûriyê xapandin û xwestin mesele weke şerekî pêkhateyên Sûriyê bidin xuyakirin.

Şêx Meqsûd taxeke Kurdan ya qedîm li Helebê ye. Di dirêjahiya 14 salên aloziya li Sûriyê tekane keleha li hemberî rejîma Baas û çeteyên Tirkiyê li ber xwe daye û kulek di dilê wan çêkiriye. Êirşên îro jî, êrişên intîqamê, hildana tola têkçûna DAIŞ`ê û derbikirina prosêsa aşîtiyê li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê ye. Di vê wateya mezin û kûr de, armanca êrişan qirkirin û paqijkirina nijadî ye. Xwestin teslîmkariyê li ser qehremanên ku teror têkbirine ferz bikin. Lew re jî meclîsa herdu taxan biryar da û tekez kir ku ew ê heya dawiyê li ber xwe bidin, teslîmkariyê qebûl nakin û seferberiya neteweyî ragihand. Îroj bi ruhê serferberiyê berxwedana Şêx Meqsûd li dar e û kula Tirkiyê û çeteyê Şamê kûr dike.



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî



**Can Yûsiv**

Hunermend Hêvîn Efrînî
"Dengê Zeytûnê û Sirûda Çiyayên Kurmênc"

Hunermend û stranbêjên jin ên Kurd di dirêjahiya dîrokê de di parastina mîrata çandî û stranên gelêrî û berevaniya nasnameya netewî û zimanê Kurdî de roleke sereke lîstin, wan stranên kevneşopî,ji nifşekê ber bi nifşekê diguhestin,bi riya dawet û şahiyan , û him bi riya şîn û behiyan, da ku ruhê strana kurdî ya akevneşopî di bîra gel de zindî bimîne.

Di nav van hunermendan de, Hêvîn Efrînî weke yek ji wan dengbêjên pêşeng ên Kurdî ku bi stran, awaz û dengê xwe yê xweş rastiya strana gelêrî û zimanê Kurdî parastiye derdikeve pêş , ew distirînê ji bo parastina nasnameyê , ji bo ku xewna xwe zindî bihêle afrîneriyê dike û di her awazekî de soza ku dê dengê kurdî zindî bimîne hildigire, heya ku jinek ji bo azadiyê distire.

Hunermendeka Kurd ji rihê axa Efrînê û bêhna çiyayên Kurmênc ji dayik bûye, ew çiyayên ku hê jî bêhna dîrokê û vedenga şaristaniyên kevnar di zinarên xwe de vedişêre , zinar û kelehên wan ruhê Med û Suberiyan hildigirin û ax û kevirên wan hîn jî mîrateya Mîtaniyan û Hûriyan lê diyar dibin.

Ji wê xaka ku hunermendên kurdên mezin lê hatîn jiyanê û bi dengên xwe yên xweş û zelal asmanê hunera kurdî ronahî kirine ,wek (Cemîl Horo, Elî Tico, Ednan Dilbirîn û Bavê Selah) , hunermenda kurd Hêvîn , ya ji şêniyên gundê bedew yê Efrînê "Elî Kero ", ku girêdayî navçeya Bilbilê, ji dayîk û bavek kurd (Sadiq Kêlo û Fehîma Yûsif), di sala 1978'an de li bajarê Helebê - taxa Cabriyê- li nav malbateke kurdperwer, neteweyî û xebatkar, ku ji çar birayên û şeş xwişkan pêk tê, hatiye dinyayê , ku dêbavê wan ew li ser nirxên resen yên kurdayetiyê, hezkirina ji axê û dilsoziya bo welat, firşik kiribûn.

Wê zarokatiya xwe di hembêza çiyayên Kurmênc de, li gundê xwe yê rengîn, "Elî Kero", di navbera deşt û geliyan de, mîna pirpirîkekî ku ji çiqilê zeytûnê ber bi kulîlka hinarê ve difiriya, derbas kir, wê ji biçûkatiya xwe de guh dida çîrokên dapîrên ku di şevên sar ên zivistanê de xêzên paşerojê vedihûnandin û li çîvçîva çivîkan û pestînên pirpirîkan guhdarî dikir ,wê guh dida li dengê bayê ku di navbera darên zeytûnan re derbas dibû, ji wan fêrî zimanê dengbêjiyê û şehrezayiya axê bû û alfabeya semfoniya wê di canê wê de afirî.

Ew stranan dibêje ji bo gundên ku ji ber şer şewitîbûn û bîrkirinê nekarîbû wan vemirîne , ji bo dayikên ku ji sebrê nan û ji êşê stranê çêdikin , ew ji bo Kurdistanê distirîne
çawa ku dayîkek ji bo zaroka xwe ya dûr û ji bo her çiqlê zeytûnê ku ji welatê xewn û evînê hatiye çinîn, ew distirîne ji bo ku welat di gotin , awaz û melodiyê de zindî bimîne, û di navbera her stran û stranekê de, ew dareke din a zeytûnê li ser xaka hunera Kurdî diçîne , jiyanê dewlemend dike û hêviyê diafirîne .

Meyla wê ya hunerî û hezkirina wê ya ji bo stran û muzîkê di temenekî biçûk de dest pê kir, di bin bandora mîrateya devkî û sirûdên jinan ên li zeviyan de, ji stranên cotkaran di demsala çinînê de, û ji jîngeha li derdora wê ji deşt, gelî û çiyayan, ku xwezayê ji biçûkatiya wê ve ew fêrî zimanê deng û awazê kir.

Ew di bin bandora stranên şoreşgerî û niştimanperwerî yên hunermendên mezin ên Kurd de ma ,mîna ( Şivan Perwer, Aram Tîgran, Mihemed Şêxo, Eyşeşan, Ednan Dilbrîn û Bavê Selah) û hin dengên din ên hunermendên kurd .

Wê jêhatîbûna xwe ya hunerî ji xwezaya bedew a Efrînê, ji deştên wê yên keskîn, ji bermahiyên wê yên dîrokî û kelehên wê yên kevnar, ku ruhê wê deverê bi dilê wê yê ciwan re hevsengiyek çêdike wergirt, lewra xweza bû neynika deng û xeyala wê ya muzîkî, wê pêlpêlûkên dengê xwe ji xumxuma sulavên Gemrûkê, xuşîna çemê Efrînê û robarên wê wergirt, ku di her dilopeka avê de,û di her hilma bayê de awazek didît ku di giyanê wê de vedenga îlhamê çêdike .

Di destpêka rêwîtiya xwe ya hunerî de, ku temenê wê ne zêdeyî deh salî bû, tevlî beşa lîstikvaniya şanoyê dibe û li wir ruhê yekem ê afirîneriyê di xwe de dibîne û fêrî zimanê pêrabûn û hesta şanoyê dibe.

Di sêzdeh saliya xwe de tevlî koma Zozan a Helebê bû, ku yekemîn menbera wê bû ku ezmûna hunera tevayî bi karbîne û dengbêjî û stranbêjiyê pêş bixe. Ew çar salan tê de ma, di gel vejînkirina şahiyên neteweyî, cejnên Newrozê û helkeftên partiyê , bi hebûna xwe ya pêbawer û hewesa xwe ya rastîn şanoyê ronî dike.

Di wan salan de bawernameya dibistana amedeyî wergirt û di temenekî biçûk de zewicî, erkên wê zêde bûn, dema ku bû dayîka çar zarokan , lewma demekê ji huner û stranbêjiyê dûr ket û jiyana xwe ya malbatî saz kir û dema xwe ji bo xwedîkirina zarokên xwe terxan kir.

Piştî deh salan,Hêvîn biryar da ku carek din vegere ser rêya hunerê, bi hêz û biryardarî, da ku rêwîtiya afirîneriya ku demekî rawestiya bû bidomîne, lê rojekê guriya agirê hunerê ku di dilê wê de pêketî bû ne hate vemirandin.

Malbata wê piştevaniya herî mezin da wê di xebata wê ya hunerî de ,ew bi bawer bûn bi deng û xewna wê û ew teşwîq kirin ku bi bawerî li ser riya afirîneriyê bimeşe.

Di sala 2013'an de bi çavên tijî rondik û bi dilekî xemgîn bi êş û bi keder ji bajarê xwe Efrînê derket û tevî malbata xwe ber bi herêma Kurdistanê ve çû, li wir, wê weke hunermendeke serbixwe dest bi qonaxeke nû ya hunera xwe kir, hesreta welatê ku jê derketî û dengê çiyayên ku ji dûr ve gazî wê dikirin, di dengê xwe de hilgirtibûn.

Di sala 2014an de, li ser vexwendina rêveberê Peymangeha Çandî ya Huner "Mezher Xaleqî" li bajarê Silêmaniyê, arşîva wê ya hunerî hate tomarkirin, ku tê de komek stranên gelêrî yên resen ên Efrînê dihewand , ku beşek ji bîranîna mûzîk ya Efrînê diparazin.

Ew her wiha di dirêjahiya du salên li pey hev de di bibîranîna cejnên Newrozê û helkeftên taybet de beşdar bû, da ku bidengê xwe germahiya mîras û ronahiya nasnameyê vegerîne.

Piştî mayîna wê di sala 2015'an de li Stenbolê , û çar mehan di sala 2016'an wek penaber li kampên Yûnanistanê, hat hilbijartin ku wek hunermendek di konserêk muzîkî de li salona Opera ya Salonîkayê beşdar bibe, bi amadebûna Balyozê Niyazpak û nûnerên rêxistinên navdewletî, ku dengê wê bi êşa sirgûnê û hesreta çiyayên Kurdan bilind bû.

Di sala 2017'an de berê xwe da Ewropayê û li Elmanyayê bi cih bû, ji bo ku ji wir bi israr û biryardarî rêwîtiya xwe ya hunerî bidomîne, di çenteyê dengê xwe de, bîranîna welatê xwe, êşa sirgûnê û hêviya vegerê ya ku di dilê wê de venamire, hilgirtibû.

Hêvîn di heyama xebata xwe ya hunerî de berhemên curbecur pêşkêş kir ku pirtûkxaneya hunerî û çandî ya Kurdî dewlemend kir, û şopeke xwe ya zelal li ser wijdana gelê Kurd li hundir û derveyî Kurdistanê hişt , wê panzdeh albûm weşand ji stranên folklorî û kevneşopî ya Efrînê , her weha panzdeh stranên taybet bi xwe jî weşand , ku bi wê nasnameya xwe ya hunerî û girêdana xwe ya kûr a bi ax, bîr û kesayetiya Kurd re tîne ziman.

Ji stranên wê yên herî navdar:

1- Efrîna min.



2- Şehîd.
3- Şêrîn Dayê.
4- Yarê.
5- Emrê Bişewat .
6- Deriya Çavê Tê:
straneke hevbeşe di navbera Hêvîn û Osman Can de).
7- Penaberim.

Wê her weha hejmarek vîdyoklîp pêşkêş kirin ku dengvedanek berfireh dan mîna:

1- Berîvan.
2- Buhara Dilan.
3- Newroz Newroz.
4- Rîhana Diçînim.
5- Rihana Şehîda.
6- Evîn.

Çawa ku ji bo evînê distirîne, ji bo welat jî stran digot, wê dengê xwe bi nifşên evîndar, xeyalperest û berxwedêran re hevrêtî kiriye ,bûye sembola jintiya stranbêjiyê û dengekî dilpak ji dengên Kurdistanê. Em di hebûna wê ya hunerî de aramiya çiyê, serhişkiya axê û germahiya dayika kurd a ku şikestinê nasnake , dibînin.

Dengê wê ne tenê stranbêjî ye,lê belgeya jiyan û bîranînê ye, dîrok diparêze û di heman demê de hêviyê nû dike.

Di dengê wê de evîndar û tekoşger, dayik û şerker, xewn û sirgûn hev hembêz dikin ,wê ji bo jiyanê stran digot, wê dizanî ku ew ji nav wêraniyan stranan dibêje , distirîne da ku hêvî zindî bimîne di dilê kesên ku tevî êşan jî baweriya xwe bi azadiyê winda nekirin .

Di gelek berhemên xwe de, mijarên koçberiyê, dûrbûna welatê û hesret û bêrîkirinê tîne ziman , û stranê wek pirekî di navbera sirgûn û welat depêşkêş dike.

Wê bawer dikir ku huner dikare bibe welatekî din dema ku welatek rastî tê bindestkirin, û deng dema ku bi rastî bilind bibe,ji çekan bihêztir dibe.

Sirgûniyê nekarî agirê Hêvîn yê hunerî û stranbêjiyê vemirîne û dûrbûnê jî nekarî wê ji evîna yekemîn dûr bike lê îradeya wê ya bi israrbûnê zêdetir kir di berdewamîya pêşkêşkirina bedewtirîn deng û hestê herî xweş yên li cem wê heyî de.

Hesreta di dilê wê de veguherî enerjiyek afirînerî, lewra her strana ku wê digot, mîna vegereke sembolîk a li Efrînê, li ax, zeytûn û hewaya wê bû.

Li pinaberiyê hebûna xwe ya hunerî ya bihêz berdewam kir, li gelek bajarên Ewropayê beşdarî bi dehan festîvalên stranbêjiyê, şahiyên netewî û cejnên Newrozê bû, her cihê ku di çûyê bi dengê xwe bîhna Efrînê lê belav dikir, hemû seyirvanên wê di wê de wêneyê Efrînê bi xwe dîtin: jineke bedew, bilind, birîndar, lê serî netewîne.

Hêvîn bi riya hunera xwe bûye semboleke çandî ya ku nasnameya bajarê ku lê jidayik bûye û dengekî hunerî yê ku derbirîna ruhê kûr ê Kurdistanê ku tevî birînan hîna jî stranan dibêje, bandora wê gihişte nifşên hunermendên jin ên ciwan ên ku di ezmûna wê de nimûneyeke serbilindiyê bo xwe dîtin, ji ber ku wê di navbera afirîneriya hunerî û helwesta mirovî, û di navbera bedewî û prensîb de, hevrêzîyek çêkir.

Di sala 2024'an de navê wê di pirtûka "Muzîkjenên Kurd li Almanyayê" de li gel deh hunermendên Kurd ên li koçberiyê ku ji aliyê lêkolîner Rosa Campion û hunermenda Kurd Şîda Qewamî ve hatiye amadekirin, cih girt û li zanîngeha Kölnê hatin xelata kirin, bo beşdarbûna wan di belgehkirina tecrûbeya hunerî ya jinên kurd de.

Hunermend, Hêvîn, keça dara zeytûnê û sirûda çiyan, hê jî ezmanê strana kurdî ronî dike bi dengekî ku bêhna axê û rastiya nasnameyê hildigire, ew awazan vedihûne wekî ku çîrokên kevnar dirêse , bi zimanê ku jê hez dikir stranan dibêje da ku di dil û bîranînan de zindî bihêle.

Bi vî awayî Hêvîn Efrîn di bilindahiya afirîneriya xwe de dimîne û hunera xwe dike bin xizmeta mirov û welatê xwe de û strana Kurdî ber bi bilindahiyên nû yên bedewî, hişyarî û mandariyê ve dibe.

# Aboriya Komînal

Aboriya komînal modeleke rêxistina aborî ye ku li ser bingeha hevgirtin û edaleta civakî ku bi beşdariya civakê hatiye şekilgirtin. Di vê modelê de, armanc ne qezenca takekesî ye, lê belê bicihanîna pêdiviyên civakê û parastina çavkaniyan e.

Navenda Nûça

Rêber Apo di pirtûka 'Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk' ya bi navê 'Li Rojhilata Navîn Krîzên Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk' de bi berfirehî bal dikişîne ser krîzên aborî û çareseriya wê. Rêber Apo di nirxandinên xwe yên li ser kapitalîzmê û civaka aborî de wiha dibêje:
"Civaka Rojhilata Navîn ji bo pêşengiya herdu nirxên aboriyê yên berî û piştî dîrokê bike bûye xwedî şens. Ango dizane aborî çiye? Vampîr û xwînmija jêre kapîtalîzm tê gotin, bi navê aboriyê felaket li ser serê wê kom kirine û ev qirkirinên rastî yên aboriyê ne. Civaka Rojhilata Navîn zehmetiyê dikişîne li vê serwext bibe û tê bigihije. Hebûna sereke ya kapîtalîzmê ji bo jiyana aboriyê bivê nevê nîne, ew bela serê aboriyê ye, kanserojena wê ye. Mirov bi tenê xebatên wê yên bi armanca karê yên li qadên mîna petrol, gaz, av û otomobîlê yên ku hawîrdorê hildiweşînin û civakê bi şeran dixeniqîne, ji hev derxe wan analîz bike, hingê rastî wê baştir bê fêhm kirin. Dîsa bêhtirî nîvê civakê bêkar, bê pîşe, koçber dihêle û vedi guherîne girseyên bêmalbat û ev jî dike ku mezinbûna felaketê çêtir divê bê fêhmkirin."
Aboriya komînal girîngiya xwe wekî rêyeke alternatîf ji bo krîzên ku ji hêla pergalên aborî yên heyî ve hatine afirandin diparêze. Ev model, ku li ser bingehên hevgirtin, wekhevî û hevsengiya ekolojîk hatiye şekil girtin. Aborî ji dîroka mirovahiyê heta roja me ya îro pêkanîna debara jiyana mirovahiyê ye. ji bo dabînkirina pêdiviyên civakê yên maddî tê pênasekirin. Ev bi rêya komunan hatiye bidestxistin. Îro, hejmara zêde ya li dora aboriyê wekî maskeyek ji bo serdestiya ji aliyê desthilatdaran ve xizmet dike.

**Aboriya Komînal bi komînê pêkan e**

Di seranserê dîrokê de, aborî her tim bi rêya komunan pêk hatiye. Aboriyek bê komîn ne mumkine. Nîşaneyên yekem ên hilweşîna civakî û pirsgirêkan bi rêya parvekirin û hevkariya komunal hatine çareserkirin. Dema ku kesek an hindikahiyek aboriyê kontrol dike, ew, di pênaseya xwe ya herî hêsan de, aboriyek taybet e, ku aboriya ku aîdî civakê ye dixeniqîne. Tiştê ku kapîtalîzm îro wekî aboriyek pêşkêş dike, di rastiyê de desteserkirina aborî û kesan bi xwe ye. Wekî ku dîroknas Braudel jî destnîşan kiriye, kapîtalîzm bêyî aboriyê yekdestdarî ye ku li ser bazarê ji bo qezencê serdest e. Serdestiya li ser aboriyê tê wateya ji holê rakirin û hilweşandina civakên ku civak ji bo dabînkirina pêdiviyên xwe berê xwe daye wan. Bi rastî, heta wê radeyê ku wan ev civak hilweşandin, wan li ser aboriyê serdestî ava kir û talan kirin.

**Lîberalîzim Aboriyê bê wate dike**

Wêranbûna aborî bi hilweşîna komunê dest pê kir. Her ku komun hilweşiya, aborî jî hate desteserkirin. Hilweşîna exlaqî û siyasî ya civakekê ku nikare pêdiviyên xwe yên bingehîn û giştî bicîh bîne, neçar bû. Encama vê hilweşînê civakek ji bermayiyên bêexlaq, îflasa siyasî û bêkar e. Bi taybetî ji ber ku hatiye tefişandin, bidestxistina nasnameyê bi mezinbûna aboriyê dê pir girîng were hesibandin. Lîberalîzm, ku her tiştî vediguherîne aboriyê û bi vî rengî pênaseya aboriyê bêwate dike, berevajî vê yekê, her diyardeyê wekî aborî jî dibîne. Bi gelemperî, aborî dikare wekî çalakiyek kêmkirina lêçûnên maddî yên pêwîst ên civakê were pênasekirin,

**Aboriya Komînal: Alternatîfeke Civakî ji bo Sîstemên Ber bi Qezencê**

Li ser bingeha hevgirtinê, hilberîna kolektîf û beşdariya demokratîk, aboriya komûnal wekî alternatîfek ku her ku diçe nîqaş û pêkanîn li dijî modela aboriya kapîtalîst li deverên cûda yên cîhanê derdikeve holê.
Her ku krîzên aborî yên cîhanî, newekheviya dahatê û wêrankirina ekolojîk zêde dibin, rexneyên li ser pergalên aborî yên heyî zêde dibin, û modelên navendî yên civakê yên wekî aboriya komûnal dîsa vedigerin nav mijarê. Ev model, ku pêdiviyên civakî li ser qezenca takekesî dide pêş, girîngiyê dide rêxistina kolektîf di gelek waran de, ji hilberînê bigire heya xerckirinê.



Armanc pêkanîna pêdiviyên civakî ye

Armanca sereke ya aboriya komunal ne zêdekirina qezencê ye, lê belê pêdiviyên bingehîn ên civakê, wekî xanî, xwarin, tenduristî û kar, têr bike. Di vî warî de, armanc dike ku beşdariya komên kêmdahat û yên bêparastin di jiyana aborî de zêde bike. Rola çalak a jin û ciwanan di pêvajoyên hilberînê de wekî yek ji hêmanên berbiçav ên aboriya komunal tê dîtin. Di gelek serlêdanan de, kooperatîfên jinan di warê serxwebûna aborî û wekheviya civakî de rolek girîng dilîzin.

**Cûdahiyên di Navbera Kapîtalîzm û Sosyalîzmê de**

Li gorî pisporan, aboriya komunal ji hem kapîtalîzm û hem jî ji modelên sosyalîst ên klasîk pir cuda ye. Her çend milkê taybet û bazarên azad di pergala kapîtalîst de berbiçav in jî, di modelên sosyalîst de aborî bi piranî di bin kontrola dewletê de tê birêvebirin. Lêbelê, di aboriya komunal de, pêvajoyên hilberîn û belavkirinê rasterast ji hêla civakê ve têne rêvebirin. Ne kapîtalîst û ne jî amûrek dewleta navendî, tenê diyarkerên aboriyê ne.
Aboriya Komûnal: Modêla Alternatîf di Serdema Krîzan de
Krîzên aborî yên cîhanî, newekhevî û wêrankirina ekolojîk bûne sedema pirsyarkirina pergalên aborî yên serdest, û "aboriya komûnal" careke din di rojeva nîqaşê de ye. Ji ber vê yekê, aboriya komûnal çi ye, ew çawa dixebite, û gelo ew alternatîfek bi rastî jî gengaz e? Di salên dawî de, enflasyon, bêkarî û xizaniyê yên zêde pirsgirêkên avahîsaziyê yên ku ji hêla aboriya bazara kapîtalîst ve hatine afirandin eşkere kirine. Rexneyên ku çareseriyên navendî yên dewletê ne bes in û bazara azad nikare edaleta civakî peyda bike, dibin sedema ji nû ve nirxandina modelên aborî yên cûda. Yek ji têgehên ku di vê çarçoveyê de derdikeve pêş aboriya komûnal e.

**Nimûneya aboriya komînal li Rojava**

Aboriya komînal yek ji bingehên projeya civakî û siyasî ya Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ye. Ev model ji felsefeya demokrasiya konfederal, xweserî, û civaka ekolojîk û jin- Ciwana tê girtin. Armanc ew e ku aborî ne li ser qezencê, lê li ser pêwîstiyên civakê were avakirin.
Aboriya komînal li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ceribandineke girîng e ku hewl dide alternatîfekê civakî û aborî biafirîne. Her çend şertên herêmê dijwar bin jî, ev model hêvî û riyeke nû ji bo pêşeroja civakê pêşkêş dike.
Li vê herêmê, aboriya komunal bi rêya kooperatîfên ku di warên çandinî, xwarin, tekstîl û xizmetguzariyê de hatine damezrandin tê bicîhanîn.
Hilberîna li ser bingeha çavkaniyên herêmî, belavkirina li ser bingeha hewcedariyan û hesasiyeta ekolojîk di nav taybetmendiyên bingehîn ên van pratîkan de ne. Pispor destnîşan dikin ku tevî hemî dijwarîyan jî, ev ezmûn beşdarîyên girîng di nîqaşên aboriya alternatîf de li çaraliyê cîhanê dike.

**Qadên sereke yên Aboriya Komînal**

1- Çandinî
-Kooperatîfên gundan û di nav komînan de
-Parastina ax û avê
-Pêşxistina çandiniyê
2. Pîşesazî û Karên Destan
-Fîrîn, kargeh, xwarin û berhemên bingehîn
-Dabeşkirina wekhev a qezencê
3. Enerjî û Ekolojî
-Hewldanên enerjiyên nûjen (roj û ba)
-Kêmkirina zirara ekolojîk e.



# Hikumeta demkî ya Sûriyê koleya derve û çavsora hundir e

Hikumeta demkî ya Sûriyê ku niha li ser erşê desthilatdariyê xwe weke sultan an jî berpirsê Sûriyê dibîne, ji hêzên derve re mîna koleyekî dixebite, lê ji bo gelên Sûriyê çavsoriyê dike û kiryarên herî xerab ji dema hatina xwe û heya niha dide meşandin.

Ronahî Sadûn

Em her car vê dibêjin ku di 8'ê Kanûna 2024'an de Sûriyê derbasî qonaxeke nû bû, lê ya rast em bêjin Sûriyê di 8'ê Kanûnê de domandina qonaxên berê bi kesayeteke din li ser desthilatdariyê dest pê kir. Ji salên şoreşa Sûriyê û heya niha aloziya Sûriyê bi tu awayî çareser nebûye, ne jî desthilatdarên Sûriyê hewldana çareseriya wê dikin an jî dixwazin. Sûriyê bi gelek rûyan re rasterast hat, her rûyek ji rûyê din reştir û bêbextir in. Dema em vê dibêjin, em ne ji valahiyekê dibêjin, ji ber van rûreşan êş, azar û derdên gelên Sûriyê zêdetir kirin, li şûna kêm bikin.!

**Ji berê de hêvî di hikumeta demkî ya Sûriyê de tune ye**

Sûriyê war û dewlemenda pêkhateyan e, lê derdê yekrengiyê di nava desthialtdariyê dikşîne. Çi kesên ku xwe kirine berpirsên Sûriyê zihniyeteke qirêj a mejiyên xwe li ser Sûriyê dane meşandin. Ev zêdetirî salekê ye ku hikumeteke nû ya demkî hatiye Şamê cih girtiye, lê wê qet ji bo gelên Sûriyê guhertin pêk neaniye. Di bingeh de hêvî di vê hikumetê de tuneye, ji ber her kes jiyana wê ya berê dizane ku ew kî ne? Ji ber kesên weke wan dîroka wan ne veşartiye ne tenê li ser Sûriyê, lê li ser hemû cîhanê jî diyare. Lê piştî ku wê xwe bi eşkere ji gelê Sûriyê re da diyarkirin, hîn bêtir hat naskirin ku wê ji bo Sûriyê nebe û nabe jî.

**Guhertina hikumeta demkî ya Sûriyê bi xwe re anî, pêşxistina şer bû**

Bi hatina hikumeta demkî ya Sûriyê re rewş hîn bêtir veguherî aloziyê, êriş û komkujî pêş jî ketin. Siyaseta kîndarî û nijadperestiyê di asteke bilind de pêk tê, ev guhertin û veguhertina ku hikumeta demkî ya Sûriyê bi xwe re anî. Destpêkê li Şehbayê, gelên koçber ên Efrînê ku li Şehbayê jiyan dikir û niştecihên Şehbayê bi xwe jî, bi derbasbûna hikumeta demkî ya Sûriyê re, dîsa li ser rêya koçberiyê ketin. Ew jî ji ber çeteyên ku ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hatine perwerdekirin û di nava hikumeta demkî ya Sûriyê de ne di 1'ê Kanûna 2024'an de berê xwe da Şehbayê û êriş li ser pêk anî, di 3'ê Kanûnê de ew derbasî Şehbayê bûn, di encamê de gelê li wir bi zorê Koçber kirin. Pê re jî dema hikumet gihaşt Şamê û li wir bicih bû, komkujî hat destpêkirin. Komkujiyên ku hatin kirin jî di bin hincetên paqijkirina ji bermahiyên rejîmê bû, destpêkê li Berava Sûriyê di navbera 6 û 8'ê Adara 2025'an de ku heya niha jî bi berdewamî ev yek tê kirin, di encamê de gelek sivîlên bê guneh hatin kuştin û piranî jî koçber bûn. Piştre di Tîrmeha 2025'an de li Siwêdayê heman şêwazê li Beravê hatibû meşandin, pêk hat. Kiryar û komkujî li van deveran bidawî nebû, lê li kêleka van jî li tevahiya Sûriyê li ser cihên pîroz êriş û teqîn hatin kirin, xwendekar, jin, zarok û karker hatin kuştin, revandin û destdirêjî pêş ket. Di heman demê dorpêçeke giran li ser taxên Kurdan ên Helebê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê vê hikumetê pêk anî. Niha jî li ser heman taxên Kurdan êrişên hovane pêk tîne, li kêlek wê ev êriş li Dêr Hafir, Dêra Zorê û Bendava Tişrînê bi rawestandin têne kirin. Ev rewş dibe sedema ku Sûriye ne ji bo her kesî be, lê ji bo kesên di bin desthilatdariya wan de bimînin.

**Li Şûna aramiyê metirsî li Sûriyê zêde bûye**

Hikumeta demkî ya Sûriyê li ser hisabê xwîna gelên Sûriyê, berjewendiyên xwe bi hêz û dewletên derve re xurt dike. Ger em bala xwe bidinê gelo hikumeta demkî ya Sûriyê ji bo Sûriyê çi pêşketin bi xwe re anî, wê demê em ê rewşa heye nas bikin çawa birêve diçe. Hikumeta demkî ya Sûriyê ji derveyî zihniyeta berdewam a Baasê, zagon û destûrên ne di berjewendiyên Sûriyan de, nivîsand. Di nava vê hikumetê de bi sedan komên çeteyên cuda cuda ku di bin destê dewleta Tirk de hatine perwerdekirin, cih digirin, praniya wan jî ne Sûrî ne. Despilîn û sîstemeke ku van çeteyan birêve bibe tuneye, bi serê xwe her tiştî li hemberî "Gelên Sûriyê" didin meşanin. Birîn û metirsiya gelên Sûriyê zêdetir bûye, êş kurtir bûye, ev yek jî li şûna ku armanî, wekhevî û yekîtî pêk were, tê kirin.

**Berê masê hat guhertin ji terorê bûn berpirsên dewletê**

Kesên ku di nava hikumeta demkî ya Sûriyê de ne, di bingehê xwe teror bû û bi sedan sûc li hemberî gelên Sûriyê kirin. Lê dewletên ku bi xwe dixwestin wê ceza bikin, berê masê guhertin û wan kirin "Şerîfên Sûriyê û ji lîsteya teroroê rakirin"! wekî ku qaşo digotin Sûriyê rizgar kirin û wê ji nû ve bi rengê tê xwestin ava bikin. Ev yek jî di asta berjewendiyên navnetewî de hat kirin, di hizira wan de "lîstokên li pişt perdê veşarî dimînin" lê rastiya heyî gelên Sûriyê di jiyana xwe de dîtin û jiyan kirin bi wê.

**Hikumeta demkî peymanên 10'ê Adarê û 1'ê Nîsanê têk bir!**

Hikumeta demkî hewldanên razîkrina dewletên derve ji bo hiştina ser erşê desthiladariyê heta asta ku xwe bikin kole jî, dike. Heta em bêjin niha tenê nav hikumeta demkî li ser desthilatdariyê ye, lê ya rast dewleta Tirk, Sûriyê birêve dibe, ji ber her tişt bi erêkirin Tirkiyê ye, ji derveyî wê tu tişt nikare pêk bê û bikeve rojevê de. Mînaka wê di 10'ê Adara 2025'an de di navbera hikumeta demkî û hêzên QSD'ê peymaneke ji 8 salan ku her xalek xwedî girîngiyeke gelekî mezin e, ji bo Sûriyê hat îmzekirin, lê destê Tirkiyê nahêle ev peyman bikeve pratîkê de. Di heman demê de di çarçoveya vê peymanê de, peymana 1'ê Nîsanê ya ji bo herdu taxên ku niha şer lê tê kirin hat îmzekirin, ev peyman bi dehê car hat binpêkirin, niha jî ev êrişên berdewam peyman têk bir. Dîsa jî zextên Tirkiyê berpirsê herî sereke yên van êrişan bû.



**'Em li Bendava Tişrînê bi ser ketin, em ê li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê jî tekez biser bikevin'**

Ji 6'ê Çileyê ve çeteyên girêdayî hikumeta demkî ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatin perwerdekirin, êrişeke hovan bi ser taxên Şêxmeqsûd û Efrefiyê de birin, bi dewamkirina van êrişan re wêraniyeke mezin a van taxan hat kirin. Di heman demê bi dehan welatî şehîd bûn û ji ber dewamiya şer hîn jî şehadet derdikevin. Herwiha nexweşxaneyên ku ji bo sivîlên birîndar tedawî bike, hat hedevgiritin, bijîşk û alîkarê bijîşkan hatin armancgirtin. Rêyên mirovî li pêşiya rewşê hatiye girtin. Ev çete di bin navê hikumeta demkî ya Sûriyê de dixebitin, bi destê Tirkiyê hatine perwerdekirin û bi eyîn şêwazê çeteyên DAIŞ'ê tev digerin. Ev yek niha di êrişên li ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de bi belge tê xuyakirin ku li ser destê wan di bin ala Sûriyê ya nû de, ala DAIŞ'ê heye. Lê gelên van taxan û hêzên Ewlekariya Hundirîn berxwedaneke bêhempa li hemberî van çeteyan didin meşandin û heya niha tevî çekên giran ji aliyê çeteyan ve tê bikaranîn, wan nikarîbûn gavekê bi pêş de bavêjin û derbasî taxan bibin. Lewra ji bo piştgiriya berxwedana gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, seferberî ji aliyê meclisa van taxan ve hat ragihandin, li ser vê bingehê jî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê berê xwe dane Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û dibêjin "Em li Bendava Tişrînê bi ser ketin, em ê li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê jî tekez biser bikevin."

Lê tiştê ku mirov hêrs dike ew e ku ji kêliya destpêkê ya şer û heya niha bêdengiya hêzên navdewletî heye, wekî ku ew rewabûnê didin van çeteyan di berdewamkirina kuştina sivîlan de. Ev êrişên hovan ên li ser gel tê meşandin careke din rûyê tarî û hişmediya qirker a hikumeta demkî ya Sûriyê êşkere dike.

**Sûriyê bûye cihê bazarê**

Herwiha tewambarkirina hikumeta demkî ku Kurd hevlbendên Îsraîlê ne, lê di encamê de hat xuyakirin ku hevalbendên wê ne, kî Colan firot û wê ji nexşeya Sûriyê ya nû derxist û niha dixwaze gelek deverên Sûriyê bifroşe. Heger Sûriyê bi vê zihniyetê hat berdewankirin, dewletek bi navê Sûriyê ji holê tê rakirin, wê her der bê firotin. Sûriyê bûye cihê bazara hêzên xwecihî û dewletên navneteweyî. Ev destkeftiya ku Ehmed El-Şara û çeteyên xwe ji bo gelên Sûriyê bidest dixe.

# Li Îran û Rojhilatê Kurdistanê serhildanên Kurdan zindî dibin

Role Mihemed

Li Îranê û Rojhilatê Kurdisatanê ji 28'ê kanûna 2025'an heya roja îro Xwepêşandan li dijî dewleta Îranê didomin. Di dîrokê de gelek caran Kurdên Rojhilatê Kurdistanê serhildan li darxistine. Li dijî darvekirin, rewşa aborî û siyaseta Îranê xwepêşandan didomin. Em rewşa serhildanên Kurdên Rojhilatê Kurdistanê ta niha vê kêliyê çi diqewime binasin.
Li Rojhilatê Kurdistanê dîsa Serhildanên Kurdan li dijî dewleta Îranê vejîn dibin. Di 28'ê kanûna 2025'an de xwepêşandan li seranserî Îran û Rojhilatê Kurdistanê li dijî krîza aborî, pirsgirêkên siyasî û civakî dest pê kirin, dewam dikin. Tevî ku dewlata Îranê bi şêwazek tund bi ser xwepêşandaran ve diçe jî lê her ku diçe xwepêşandan berfirehtir dibe. Li dijî dewleta Îslamî ya Îranê ne tenê Kurd rabûne, hemû pêkhate li dijî vê desthilatê ne. Di dîrokê de li Rojhilatê Kurdistanê gelek serhildanên Kurdan lidarketine.

**Hemû serhildanên Kurdan ji bo azadiya Kurdistanê ne**

Weke Simkoyê şikakî, Komara Mihabad û ya herî dawî Serhildana Jîna Emînî. Em ê bal bikşînin ser serhildanên Kurdên Rojhilat û berxwedana wan. Serhildana Simkoyê Şikakî di navbera 1918–1922'an de dest pê kir, û paşê jî di sala 1926'an de serhildanên din li dijî hêzên Îranê kir. Ew ji bo azadiya Kurdistanê şer kir, lê di sala 1930'î de Simko Şikakî ku ji Ûrmiyê bû, ji hêla hukûmeta Pahlewiyan ve hate kuştin. Her wiha di sala 1946'an de, di li bajarê Mahabad (Rojhilata Kurdistanê li Îranê) de serhildan dest pê kir. Ev Serhildan bi pêşengtiya Qazî Mihemed Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK-Îran), serokê Komara Kurdistanê hate dest pê kirin. Qazî Mihemed û hevalên wî hatin darvekirin.

**Qazî Mihemed: Kurdistanê her welateke nabe çar**

Komara Kurdistanê ango Mihabadê 11 mehan domand. Komara Mahabad bû nimûneya yekem di dîroka Kurdan de. Her çend ku bi dawî bû jî, lê ji bo Kurdan heta niha wekî nimûneya berxwedan û azadiyê ye. Ev tecrûbe û berxwdana Komara Mihabetê di kurdan de bi gotina Qazî Mihemed 2+2=1 û nabe çar rihê yekîtiya netewî avakir. Kurdisatan her welateke nabe çar. Ev silogan rê li ber yekîtiya Kurdî vekir li çar aliyên Kurdisatanê.

**Serhildana Jîna Emînî rê li ber Şoreşa Jin vekir**

Li aliyekî din jî di sala 2022'an de Serhildana Jîna Emînî (Mahsa Amini) dest pê kir. Keça Ciwan a Kurd ku bi navê Jîna Emînî tê nasî ji aliyê polîsên Îranê ve hate qetilkirin. Lê qetilkirina Jîna serhildaneke mezin li Îran û Rojhilata Kurdistanê vekir, bi dirûşima"Jin, Jiyan, Azadî" hate nasîn. Ev serhildan sînorên Kurdistanê derbas kir û ji bo tevahî jinan bû mînak. Serhildana Jin Jiyan Azadî ku li Rojhilat dest pê kir, şoreşeke jinan li dar xist. Hemû serhildanên Kurdan ji bo azadiya Kurdistanê rabûne.

**Rihê berxwedanê careke din vejîn dibe**

Em balbikişînin ser rewşa niha ya Îranê û Rojhilatê Kurdistanê. Li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê, serhildanên Kurdan bi taybetî ji bo mafên mirovan, zextên aborî û siyasî berdewam in. Di çend salên dawî de, bi deh hezaran kes li bajaran wekî Sine, Kirmaşan, Îlam û Hemedanê xwepêşan hene. Niha jî Xwepêşandan li Îran û Rojhilatê Kurdistanê di roja 10'emîn de didomin. Lê ew rihê ku di sala 1946'an de li Mihabatê vejînbibû îro careke din li Mihabad û Kirmanşah bilind dibe. Dilê her Kurdekî niha bi Kurdên Rojhilatê Kurdistanê re lêdide.

# ‘Civatên ji bo kîndarî û şerê mezhebî nayên qebûlkirin’

Rûspiyên Êla Sada û Eşîreya Elbûşêx diyar kirin ku civatên ji bo kîndarî û şerê mezhebî nayên qebûlkirin, kesên van civînan li dar dixin nûnertiya xwe tenê dikin û gotin, “Hikumeta demkî ji bo lawaziya xwe ya siyasî û aborî veşêre, gavan ji bo bidawîkirina tevlîheviyan naavêje.”

**Hemza Sêvo**

Di nav tevliheviyên qada siyasî de ku Sûriyê tê de dijî, bi navê eşîreyên Erebî çend kes bi navê eşîreyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kombena Eşrîreyên Cizîrê di 4’ê Çileyê de li Dêrazorê hate lidarxistin. Di wê civatê de kesayetên ku dixwestin li dijî Hêzên Sûriyaya Demokratîk şer derxin û pêkhateya Ereb gur bikin li hemberî QSd’ê. Derbarê heman mijarê Şêxê Eşîreya Elbûşêx Fayiz Elcedian û nûnerê Êla Sada Fehed Elşêxanî, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji rojnameya me re axivîn.

**‘Nûnertiya xwe tenê dikin’**

Fayiz Elcedian diyar kir ku kesên ku bi navê eşîreyan civatan ji bo fitneyê dikin, nûnertiya xwe tenê dikin û wiha got: “Wekî tê zanîn beriya çend rojan civatek li Dêrazorê di bin navê eşîre û lên Ereban hat lidarxistin. Bi van civatên ku tên ldarxistin hin kesayetin hene dixwazin bi navê civaka Erebî li Sûriyê biaxivin û tevbigerin. Lê ev kesên wiha tenê nûnertiya kesayeta xwe dikin, ew nûnertiya civaka Erebî nakin. Eşîreyên Ereban û helwesta wan li Sûriyê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê diyar in, yên li ser rûyê erdê tevdigerin û yên xwedî rol tên dîtin. Kesên wiha ku tu kes alîgiriya wan nake, civatan ji bo pêkanîna fitneyan bi rê ve dibin. Eşîreyên Ereban van kesan ji xwe re weke nûner nabîne, ji ber ku armanca wan derxistina tevlîheviyê ye. Ew ji bo berjewendiyên hêzên derveyî Sûriyê tên bikaranîn. Hêzên ku destwerdanê di pirsa Sûriyê de dikin, dixwazin Sûriyê wêran bikin, ev yek jî dikeve bin xizmeta wan de.”

**‘Divê zext li hikumeta demkî pêkwere ji bo pêkanîna peymanan’**

Şêxê eşîreya Elbûşêx Fayiz Elcedian da tekez kir ku divê zext li hikumeta demkî were kirin ji bo pêkanîna peymana 10’ê Adarê û wiha bi dawî kir: “Hikumeta demkî di nava tevlîheviyê de dijî, ne xwedî biryareke serbixwe ye. Ew li dijî kesayetên ku tevlîheviyê dikin ranaweste. Heta ku hewldanên fitneyê bên rawestandin pêwîst e hin gav bên avêtin. Di serî de divê hevgirtin di nav gelan de û cebheya hundirîn xurt bibe, di heman demê de pêwîst e panêl û civîn bi beşdariya hemû şêxên eşîreyan ên xwedî bandor li eşîre û êlên xwe were lidarxistin. Em weke şêxên eşîre û êlên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di hemû geşedanên ku hatine qewimandin amade bûn. Roleke me ya aktîf hebû, dema heyî di hemû civîn, hevpeyvîn û çalakiyan de piştgirê didin peymanên hikumeta demkî û Rêveberiya Xweser. Ev peyman mafê hemû pêkhateyên Sûriyê diparêze. Heta ku ev Peymana 10’ê Adarê bi cih were divê hikumeta demkî bikeve bin zextê. Ji bo pêkanîna vê peymanê pêwîst e li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê meş, mîtîng û hemû cûreyên çalakiyan bên lidarxistin.”

**‘Civatên ji bo derxistina şerê mezhebî nayên qebûlkirin’**



Fayiz Elcedian



Fehed Elşêxanî

Fehed Elşêxanî anî ziman ku civinên ji bo derxistina şerê mezhebî tu carî nayê qebûlkirin û wiha axivî: “Rewşa rêxistinî ya hemû pêkhate û beşên civakê tiştekî erênî ye. Wek Rêveberiya Xweser, em pêşengiyê ji civînên dikin ku di xizmeta yekbûna welat û civakê de bin. Ji bo naskirina nêrînên cûda li ser mijarên cûda û xebata hevbeş civata gelên Sûriyê tiştekî baş e. Lê belê, eger armanca wan civînan gurkirin, kîndarî û destpêkirina şerê mezhebî be, wê neyên qebûlkirin. Ji ber wê gelek encamên neyînî bi xwe re bîne û di dawiyê de wê di navbera pêkhateyên Sûriyê de pevçûn çêbibe û her kes vê yekê red dike.”

**‘Hikumeta demkî ne cidî ye ji bo lihevkirin û aştiyê’**

Elşêxanî destnîşan kir ku hikumeta demkî ne cidî nêzî peymanên ji bo lihevkirin û aştiyê dibe û wiha domand: “Parêzgeha Dêrazorê ji ber giraniya demografîk komên hebûna eşîreyan, rêyên stratejîk û çavkaniyên jêrînxaneyê yên cûrbecûr ên wê, bi taybetî hebûna petrolê, di rojevên tevgerên radîkal ên di nav hikumeta demkî ya Sûriyê de ye. Ev tevger ji hêla dewleta Tirk ve tê rêvebirin û ji bo Tirkiyê xwedî girîngiyeke mezin e. Ji ber vê yekê, şer û sorkirin li wir ji bo hikumeta demkî û rejîma Tirkiyeyê pir girîng e. Civînên bi vî rengî di dema ku nûnerên Hêzên Sûriya Demokratîk û hikûmeta demkî li hev dicivin de ji bo gotûbêjkirina awayên pêkanîna mercên peymana 10’ê Adarê, hin tiştan dide tekezkirin. Yek ji van tiştan ew e ku hikumeta demkî ya Sûriyê ne cidî ye ku bigihîje çareseriyên aştiyane yên berfireh ji bo pirsgirêkên cûrbecûr. Herwiha dide tekezkirin ku nakokî di nav hikumeta demkî de heye û du alî di nav de heye, yek ji wan li çareseriyan digere û ya din jî şer dixwaze. Di heman demê de ev yek misoger dike ku Şam bi ejandeyên derve bi taybet dewleta Tirk ve girêdayî ye, ev ejinde nahêlin ku lihevkirin di navbera hikumeta demkî û QSD’ê de bi çi awayî be çêbibe.”

**‘Hikumeta demkî da ku lawaziya aborî û siyasî veşêre, tevlîheviyê derdixe’**

Nûnerê Êla Sada Fehed Elşêxanî diyar kir ku hikumeta demkî ji bo lawaziya xwe ya siyasî û aborî veşêre gavan ji bo bidawîkirina tevlîheviyan naavêje û wiha qedand: “Wekî ku me berê jî diyar kir, di nav hikumeta demkî ya Sûriyê de, du aliyên nakok hene, yek li çareseriyên aştiyane digere û ya din jî li gorî daxwazên dewleta Tirk digere. Ji ber vê yekê, gurkirina nakokî û gotinên nefretê di navbera pêkhate û gelan de dibe amûra herî bihêz ji bo bidestxistina armancên dewleta Tirk. Hikumeta demkî nikare çareseriyan ji bo pirsgirêkên siyasî, aborî û îdarî bibîne, ev yek dihêle ku rêbazên wekî gurkirina agirê fitne û kîndariyê hilbijêre da ku raya giştî bi şeran ve mijûl bike. Ji ber vê mijarê em tu gavên hikumetê nabînin ji bo bidawîkirina xîtaba kîn û nefretê yên ku li dijî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û civaka Kurd pêktên.”





## Vê zihniyeta Kurdkujiyê, wê serê wan bixwe

**Ahmet Aktaş**

Dîroka desthilatiyên tirkan, ji aliyê cîhanê vê tê zanîn ku hemû talan,wêran, qirkerî û dagirkeriye. Tê gotin, ku di dema êrîşên xan û sergirdeyên wan ên Ewrûpayê de, jiber wahşetên dijwar ên li ser gel, ji bo ku zarokên xwe bixin xewê, êrîşên tirkan dianîn bîra wan û digotin; “heke hûn ranezên, eha leşkerên tirkan tên wê” .
Heman tişt li Kurdistanê jî tên gotin di stranên dengbêjan de, ku dibîjin; “zulma we wek a leşkerê Roma Reş in” !
Newêrîbûn navê “tirkan” bigotana, şwîna wê dibêjîn ROMA REŞ, dibe ku bi vê şêwazê zulma Roma jî nîşan didin.
Ev êrîşên van rojên dawî ku li ser gelê me yên taxên ŞÊXMEQSÛS, EŞREFIYÊ û BENÎ ZÊD ên Helebê tên meşandin, jiber gûman tê de nîne ku ji aliyê dewleta Tirk ve tên birêvebirin, ew zihniyeta wan a wahşeta dîroka wan, tîne bîra mirovan.
Hilbet, ew kiryarên wan ên dijmirovahî yên li Efrînê, Serêkaniyê, Girêspî û hema li hemû Rojava dan meşandin û hîn jî didin meşandin, ji bîra kesî naçe.
Îca însan ji xwe jî dipirse, erê di dîrokê de û nuha jî şer û pevçûn li gelek cih û waran pêkhat û pêktên, lê êrîşkariya bi taybetî li dîjî gelan, baweriyan û bi taybetî li dijî gelê Kurdistanê ya ewqas sal didomê û mayînde ye, gelo çima?
Ew gotina pêşiyên Kurdan tîne bîra mirovan; “kurmê şîrî heta pîrî”, ev tê wateyê ku çavkaniya vê zihniyeta mirovkujî ya desthilatên tirkan, ji dîroka wan a kevnar tê, mîna zarokên ji şîrê diya xwe vîrûsên xwînxwariyê girtibin!
Bê eyb û şerm, li vê dewleta xwe ya xwînrij, navê cumhuriyetê jî lêsiwar kirine.
Lê, em bala xwe didinê ku bingeha xaniyê saziya vê cumhuriyetê, bi naveroka sistema netewdewletê, li ser rijandina xwîn û kuştina gelê Kurdistanê hatiye damezrandin, ev jî tê wateya bi bîrdozî û siyaseta tunekirina nasname û baweriyên gelê Kurdistanê hatiye birêvebirin û hîn jî didomînin.
Çend mînakên balkêeş hene, ku zîhniyet û kiryarên dîroka wan zelaltir nîşin didin.
Gotina ku “me ev doza kurdan kuşt û xist bin xaka Çiyayê Agiriyê û ser wê çimento kir”, “ji bilî Tirkan mafê kesî tine ye ku li vî welatê Tirkiyê bijî” û hwd.
Bûyera Dr.Nûrî Dêrsimî ji hemuya xemgîntir û watedartir e.
Ji bo nekeve destê wan zaliman diçe Urdunê, MITa Tirika ji bo kuştina wî didin pey wî, pêdihese derbasî Libnanê dibe, jiber ku dîsa li pey wî ne derbasî Sûriyê dibe. Weke kesekî jiber şûrê wan filîtî be, naxwazin sax bimîne.
Lê belê gelê me yê ku nuha neviyên wan li Helebê û hemû Rojava berxwedana dîrokî dimeşînin, wî diparêzin ji dewleta tirka ya Kurdkuj.
Dr.Nûri Dêrsimî, di 22.8.1973 de li Helebê xatir ji me dixwaze û nuha di himbêza xaka pîroz a Efrîna birîndar de qehremaniya gelê xwe temaşe dike.
Û vê carê gelê me, wê tola doktor û hemû gelê me ji van dewletên dagirker bistîne û wê zihniyeta wan vê carê serê wan bixwe!
Serkeftina şoreşa Jin Jiyan Azadî jî nêztir bûye!



# Gelo wijdanê wan li ku derê ye?

Goristanên şehîdan, mezargeh, mizgeft û dêrên îbadetê di nava civakan de cihên pîroz in ku pêwîst e hurmet ji wan re bê girtin. Lê dewleta Tirk û çeteyên wê hemû pîvanên mirovahiyê binpê dikin û cihên pîroz jî wêran û talan dikin.

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Her civakek xwedî pîvan, rojên girîng û cihên pîroz e ku pêwîst e rêzgirtin jê re were kirin. Her civakek ango pêkhateyek roj û kevneşopiyên wan hene ku resenî û hebûna wan gelan didin diyarkirin. Herwiha her civakek çand û baweriyên wan cûda ne, ku bi wê rengî di nava civakan de tên xuyakirin û dibin xwedî taybetmendiyên cûdatir. Xweşikbûna Sûriyê bi pirrengiya wê ye. Sûriyê bi cûrbûna gel, netew û pêkhateyên xwe tê nasîn. Di nava Sûriyê de pêkhateyên Ereb, Kurd, Elewî, Durzî, Ermanî û Xiristiyanî jî hene. Yê ku Sûriyê ji dewletên din cûda dike pir pêkhateyên wê ye.
Goristanên Şehîdan, mezargeh, mizgeft û dêrên îbadetê pîvanên mirovan temsîl dikin û li dgorî pîvanên mirovî û exlaqî, herwiha li gorî zagonên navneteweyî talankirin û wêrankirina cihên pîroz sûcek e.
Lê li Sûriyê komên çete ku dorî exlaqê civakî ne û bi zihnyeteke qirker tevdigerin bi awayekî hovane goristanê şehîdan a li herêmên dagirkirî û yên di bin serweriya hikumeta veguhêz de bombebaran dikin û talan dikirin. Ev çete ne tenê hovîtiyê li dijî mirovên zindî dikin, ew li dijî goristanên şehîdan jî hovîtiyê dikin. Van cihên pîroz taêlan û wêran dikin.

**Goristana şehîdan a Efrînê**

Goristana şehîdan a li Efrînê û gundewarên wê di dema şerê Efrînê de ji aliyê dewleta Tirk ve bi çekên giran hat bombebarankirin û di encamê de goristan wêran bû. Herwiha li gundê Kefirsefrê goristana şehîdan a bi navê Şehîd Seydo ji aliyê dewleta Tirk ve bi awayekî giran hate bombebarankirin û piştî dagirkirina EFrînê çeteyên DAIŞ’ê dîsa çareke din goristan talan kirin, kevirên wê şkandin û dizîn. Li gundê Metîna ya Efrînê goristana Şehîdan a bi navê (Refîq) ji aliyê çeteyên dewleta Tirk ve hat talankirin. Herwiha li bajarê Efrînê goristanên Şehîdan hebûn, ev goristan ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên pê ve girêdayî hatin talankirin û bi amûrên giran (tirêkês) bi ser goristana Şehîdan re çûn bi axê re kirin yek û ew goristana şehîdan dozkirin.

**Sûcên li dijî mîraseya çandî**

Artêşa dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê Goristana Şêx Hemîd a Êzidiyan a li gundê Qestel Cindo a girêdayî Efrînê talan kir û darên bi temen ên li derdora wê birîn. Goristana Şêx Hemîd ji bo Kurdên Êzidî cihekî pîroz e ku di şahî û cejnan de serdana wî dikin. Çeteyên dewleta Tirk a dagirker bi armanca lêgerîna kevnarên dîrokî çend caran goristan hilweşand. Ev ne cara yekemîn e ku dewleta Tirk û çeteyên wê sûcên xwe li dijî mîraseya çandî ya Êzidiyan pêk tîne. Piştî dagirkirina Kantona Efrînê gelek goristan hilweşandin. Beriya vê jî çeteyên dewleta Tirk mezintirîn mezargeha Êzidiyan a li çiyayê Şêx Berekat a bajarê Derêt Ezê desteser kirin û piştî ku kevneşopên Êzidiyan ji wir derxistin goristan kir navenda çavdêriyê.

**Goristana şehîdan li Şehba**

piştî dagirkirina Efrînê ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên pê ve girêdayî, gelê Efrînê berê xwe dan herêma şehba û li wê de bi cihbûn. Careke din di Kanûna 2024’an de herêma Şehaba ji aliyê komên çeteyan ve hate êrîşkirin û dagirkirin. Bi koçberiya duyemîn a gelê Efrînê re gelek komkojî û binpêkirin li ser gel hate kirin. Piştî çeteyên DAIŞ’ê Şehba dagirkirin berê xwe dan goristan şehîdan a li Ehrezê û ew cihê pîroz talan û wêran kirin.

**Giristana Şehîdan li Minbic**

Artêşa dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê di Kanûna 2024’an de bajarê Minbicê dagir kirin. Bi dagirkirinê re dest bi dizî û talankirina milkên giştî û taybet kirin. Li bajarê Minbicê, çeteyên dewleta Tirk a dagirker kevirên goran ên li Goristana Şehîdan talankirin û dizîn. Diziya keviran û xerabkirina gorên Şehîdan di çarçoveya siyasetên plankirî yên dewleta Tirk û çeteyên wê yên têkbirina sembolan de têne kirin.



**Goristana Şehîdan a Şêxmeqsûd**

Komên çekdar ên girêdayî hikûmeta veguhêz a Sûriyeyê, goristana Şehîdan a Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi roketan topbaran kirin, di encamê de ziyanên mezin çêbûn. Komên çekdar ên girêdayî hikûmeta veguhêz a Sûriyê, di 22’ê kanûnê de bi tankan û topan êrişî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê kirin, di encamê de jinek şehîd bû û 19 kes birîndar bûn.

**Dêra Mar Elyas li Şamê**

Di 22 Hezîrana 2025 de encama êrişa xwekuj ya li dijî Dêra Mar Elyas a li Şamê de 22 kesan jiyana xwe ji dest dan û 63 kes jî birîndar bûn. kesekî xwekuj xwe di hundirê dêrê de teqand, di encamê de gelek kesan jiyana xwe ji dest da û agir bi avahiyê ket. Heya vê demê jî tu kesê berpirsyariya êrişê negirtiye ser xwe. Ev êriş yek ji êrişan herî tund bû ku nava çend mehên dawî de li Şamê pêk hat, sedema vê yekê jî neqebûlkirina pêkhateyan û kêm ewlehiya de nav gelan de ye.

**Mizgefta li Humisê**

Di 26’ê Kanûnê de Li taxa Wadî El Zeheb a bajarê Humsê teqînek di hundirê mizgefta Imam Elî Bin Ebî Talib ya Elewiyan de çêbû. Rêveberiya Ambulans û Rewşên Awarte ya Wezareta Tenduristiyê ya Hikumeta Veguhêz a Sûriyeyê ragihand ku li gorî agahiyên destpêkê 5 kes hatin kuştin û 21 kes jî birîndar bûn. Enser El sina ev bûyer girtin ser milê xwe û di esas de ew gêrêdayî çateyên DAIŞ’ê ne.

# Navenda Çav a Rapirsînê her tim di tevgerê de ye

**Solîn Mihemed/Qamişlo**

**Rêveberê Navenda Çav a Rapirsînê Silêman Ilyas diyar kir ku ew lêgerîna rapirsînan li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê digirin dest û wiha got, ‘Armanca navenda me ew e ku em raya gel di derbarê mijarên girîng de bi awayekî fermî diyar bikin.’**

Navenda Çav a Rapirsînê ji 2023’an ve li Qamişlo hate damezirandin. Herwiha armanca Navenda Çav a Rapirsînê ew e ku raya gel di derbarê mijarên girîng de bi awayekî fermî diyar bike. Navenda Çav navedeke ku têkildarî mijara çavdêrî û girtina nerîna raya giştî xebatên xwe didin meşandin. Di navendê de 25’ endama cihê xwe digirin û her endamek karî wî cûda ye.

Di derbarê kar û xebatên xwe de rêveberê Navenda Çav a Rapirsînê Silêman Ilyas ji Rojnameya me re axivî.

**‘Destpêka salê karê me rawestiya’**

Silêman diyar kir ku destpêka salê karê wan rawestiya û wiha got: “Di destpêka salê de piştî rêjîma nû, karê me rawestiya û tevlîhevî çêbû. Lê niha dîsa karê me baş tê meşandin, em niha zêde guh didin karê Rêveberiya Xweser ji bo nirxandina birêveçûna hemû mijarê jiyanê yê ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê çêdibin. Em zêde berê xwe didin mijarên Rêveberiya Xweser yên karên aborî, şaredariyê, nexweşxane, çandinî, dibistan û tirafîk, em bi van saziyan re didin xuiyakirin ku çi xalên wan yên kêm hebin em wan dişopînin û herwiha kevneşopiyên wan çêdikin, em didin rayedarê Rêveberiya Xweser û hem jî em di malperên xwe de belav dikin. Ji heyva 4 an û 5 an ve me dest bi rapirsînên xwe kirin, ev rêpirsîn jî li bajarên Dêrik, Tebiqa, Reqa, Kobanê, Hesekê, Dirbêsiyê, Amûdê, Qamişlo, Tirbespiyê, Çilaxa û Girkêlegê li van hemû bajaran me dest bi lêpirsînê xwe kirin. Di navenda me de jî gelek beş hene, beşa pilankirin û amadekirina pirojeyan, komkirin û lêhûrbûna agahiyan, beşa meydanî, erşîv û belgekirin, edîtorî û weşandin û hwd… hene.”

**‘Çarçoveya kar û xebatên me lêgerîna rapirsînan e’**

Silêman Ilyas anî ziman ku çarçoveya kar û xebatên wan lêgerîna rapirsînan e û wiha berdewam kir: “Lêpirsînên me jî wek ku li zanîngehê bi xwendekaran re, mamoste, rêveberiyan em nêrînên wan bi giştî li ser zanîngehê digirin û pirsên xwe ji wan dikin. pirisgirêkên ku derdikevin pêşiya me gelekin, hem hin kes hene ditirsin ji ber rêgerîna me ya rêpirsînê. Herwiha lêpirsînên û gerîna me ne zêde pêşketî ye ji ber vê yekê me navend çêkir da ku di nav miletên xwe de bêtir bi pêş bixin. Di heman demê de girûpên me 11 de ne her 2 bi tena xwe derdikevin. Girûpa ku diçe Kobanê ji 5 kesan pêk tê herwiha ya li Qamişlo jî 16 kes hene û bi giştî ji 25’ endaman navend pêk tê. Raprisînên me heya em digirin dest dem jêre divê heya ku pirsan dinivîsînin ji ber ku her mijarek ji hev cûda ye. Di her lêpirsînekê de em carinan heftiyekê pêve dimînin û herwiha di her du mihan de lêpirsînek çêdibe. Ji xwe niha di dawiya salê de 6 rêpirsînên me çêkirin li ser mijarên herî girîng.”

**‘Mijarên ku em digirin dest em wan digihînin Rêveberiya Xweser’**

Rêveberê Navenda Çav a Rapirsînê Silêman da diyarkirin ku mijarên digirin dest digihînin Rêveberiya Xweser û wiha bidawî kir: “Em dengê cîhanê digihînin rêveberiya xweser herwiha karê me ewe ku em mijarên digirin dest bigihînin rayedaran û saziyên elekdar. Ji xwe niha di dema pêş de mijarên me bêtir li ser rewşa siyasî wê bên



sekinandin, ku çi çêbibe em ê li ser wan bisekinin. Di heman demê de cihên ku pirisname lê hatin kirin, li ser şaredariyê ji dîroka 27/4/2025 an heya 4/5/2025 an li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê 1078 pirisname hatin kirin. Herwiha li ser çandiniyê jî ji dîroka 25/5/2025 an heya 1/6/2025 an li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji 645’ pirisname, li ser Pergala trafîkê ji dîroka 6/7/2025 an heya 10/7/2025 an li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê 701 pirisname û li ser rewşa aborî ya kesane ji dîroka 21/9/2025 an heya 25/9/2025 li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê 1013’ pirsname hatin kirin.”